Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1347 1-Sibat-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Klîpa “Em Bernadin” berxwedana gelê Kurd belge dike’

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Rêveberiya Studya Mizgîn Zeyneb Mensûr anî ziman ku klîpa “Em Bernadin” têkoşîn û berxwedana gelê Kurd belge dike, dengê wan digihîne cîhanê û tekez dike ku îrade û rûmet ji dorpêçkirin û êşê bihêztir in.**



Kilêpa “Em Bernadin” berhemeke hunerî ye ji rêzeberhemên Hilala Zêrîn û Mizgîn Studyo ye, ew peyameke berxwedan û biryardariyê ye ku ruhê berxwedana Kurdan li hember dorpêçkirin, gef û êrîşên berdewam ên li ser herêmê temsîl dike. Gotinên stranê baweriya gelê Kurd bi nirxên rûmet, fedakarî û yekîtîyê nîşan didin, herwiha qehremaniya jin û dayikan li Rojava û herêmên din tînin bîra mirov. Girêdayî mijarê Rêveberiya Studya Mizagîn Zeyneb Mensûr ji Rojnameya me re axivî.

**‘Me îlhama xwe ji berxwedaniya Şêxmeqsûd û Eşrefiyê girt’**

Zeyneb Mensûr anî ziman ku çavkaniya ku wan berhemên xwe di klîpa em Bernadin jê girt berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bû û wiha got: “Erê em li Qamişlo dimînin lê hest û mejiyê me li her dû taxan bû, me rewş û berxwedanan ku ki wir dihate meşandin dişopandin. Bi taybet piştî ku Fermandar Ziyad Heleb vîdiyoya biryara man û name belav kir, me berxwedaniya wan dît û jê bibandor bûn û me xwest em karekî bikin ku nirxên vê berxwedaniyê derxînin, lê belê em çiqasî bi gotinên xweş yan muzîka xweş em ê nikaribin vê berxwedaniyê pênase bikin. Piştî vê rewşa ku li aliyên herêmên Tepqa, Reqa û hem jî gefên ku li herêmên Cizîrê û Kobanê dihatin dayîn me tê de berxwedan, hêz û moralê gelên Kurd dît, ku çiqasî destek bûn û xwe ji pişta hev nedan alî



û li ser doz û biryarên xwe man. Li ser vê bingehê me xwest ku berhemekê kurdî çêbikin ku moral û hêza gel zêdetir bikin û piştgiriyê bidin şervanên xwe. Stran tekez dike ku Kurd dê axa xwe neterikînin û teslîm nabin û ew amade ne ku bi her kesê ku hewl dide nasnameya wan an axa ku ew lê dijîn ji holê rake re rûbirû bibin. Her wiha piştrast dike ku fedakirina jiyanê û parastina mafan ne hilbijartinek e, lê erkek neteweyî û exlaqî ye û ruhê berxwedanê dê di her mal û kolanekê de, li her tax û bajarekî de zindî bimîne.”

**Peyamek ji bo yekîtî û berxwedanê**

Zeynep Mensûr li ser peyama wan ji vîdyo Klîpa Em Berndain wiha got: “Bi gotinên strana Em Bernadin, dengê hunerê vediguherîne platformek ji bo qêrîna kolektîf û peyamek bihêz digihîne cîhanê ku gelê Kurd têkçûnê qebûl nake û çi qas dijwarî û zehmetî mezin bin jî, dev ji ax û nasnameya xwe bernade. Peyama me ji bo çêkirina berhemê ne tenê ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû, lê belê me bal kişand li ser serhildana gelên Rojhilatê Kurdistanê jî, herwiha me bi pênaseya kurdatiyê dest bi çêkirina strana xwe kir. Kêşana klîpê ji ber rewşa nebaş di nava taxên Qamişlo de me di demek kurt de qedand ew û tê de me hewil da ku hêz û moralê gel li taxan pêşkêş bikin. Di heman demê de peyama ku em dixwazin pêşkêş bikin, ku her kurdekî li cîhanê dengê kurdan ji her kesekî li hemberî êrişên ku li dijî kurdan tên kirin guh û çavên xwe ji bo berjewwendiyê xwe girtine û gelên kurd di rewşek xerab de hiştin û berdan.
Gelek bi çavekî guneh li kurdan dinêrin, lê em ne ê ku bi çavekî guneh li me binêrin, em kurd kesayetin mêrxasin me di şerên xwe de tu carî binketin qebûl nekirine û em qebûl nakin. Pêwîste em kurd xwedî li hev derkevin û yekîtî û kurdetiya xwe bidin pêş li her çar parçeyên Kurdistanê, ev bi tena xwe dibe peyamek ku bersivdayînek ji her dewletek ku çavên xwe ki hember êrişên ku di derheqê kurdan tên kirin girt, herwiha ku îro roj kurdên me yên li Kobanê di bin dorpêçkirine de ne û hîn jê tu careserî ji vê dorpêçê nehatiye dayîn, di heman demê de pêwîste ku em rewşa koçberên Efrîn û Şehbayê ku ev pênc carin tên koçberkirin pêşkêş bikin. Û divê em weke kurd li hemberî van êrişan bi hemû hêza xwe bisekinin û bibin bersiv ji hemû cîhanê re ne bi tenê çeteyên DAIŞ’ê û Hikûmeta Demkî.”
Rêveberiya Studyaya Mizgîn Zeyneb Mensûr axaftina xwe wiha qedand: “Li dijî van êrîşan rawestan erkêkî exlaqî û neteweyî ye û divê Kurd ne tenê di rûbirûbûna bi çeteyên DAIŞê û hikûmeta demkî de, lê di parastina hebûn, rûmet û mafê jiyaneke azad de ji bo tevahiya cîhanê dengek bin. Hêviya me ew e ku yekîtiya kurdî were avakirin û em kurd bi yek dest welatê xwe, hebûn û nasnameya xwe biparêzin. Pêwîstiya me bi tu deverin din tune ye ku werin me biparêzin, ji ber ku em kurd têra xwe hene.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER DERFETÊ**

**Çemê min çokanê min, rehmet li dêbavên min:**
- Ji destê min ev tê; ji bilî vê ez nikarim tiştekî din bikim; ji bilî vê ez tiştekî din nizanim.
**Darê min kopalê min rehemet li dêbavên min:**
- Bi heman wateyê.
**Deriyekî nû vekir:**
- Têkiliyeke din danî; kesekî din nas kir.
**Ez li ber lingê xwe bibînim/ez riya li ber lingê xwe bibînim:**
- Ez vala bibim; derfetên min çêbin.
**Ez li ber piyê xwe bibînim:**
- Ez karê xwe bi ser hev ve bidim; serê min rihet bibe.
***Niha karê min pir e, hema ez li** ber piyê xwe bibînim ezê werim seriyekî li te bidim.
**Ez ber xwe bibînim:**
- Bi heman wateyê.
**Ez pêşiya xwe bibînim:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BÊDERFETIYÊ**

**Dest nade:**
- Ez nikarim; rewşa min ya aborî ne guncaw e; ez ji bo kirînê ne amade me.
**Destê min jê nagire:**
- Ez nikarim xwe bigihînimê; xwe nade dest; xwe nêzîkî min nake.
**Destê min tijî ye:**
- Ez niha mijûl im; ez niha ne betal im; ez niha karekî dikim.
**Destê min ne vala ye:**
- Bi heman wateyê.
**Destvala ye/destê wî vala ye:**
- Ji bo ku bikare li ber xwe bide, şer bike çekek, tiştek pê re nîne.
**Ebayê wî ketiye nav lingên wî:**
- Ji bo ku karê xwe baş bike, amûrek, tiştek pê re nîne.
**Ez ne vala me:**
- Ez niha mijûl im; ez niha ne betal im; ez niha karekî dikim.
**Ez ya xwe tê re nabînim:**
- Keysa min lê nayê.
**Ji kêvjalê re gotin tu çima xwar dimeşî got; keysa min hew jê te:**
- Derfetên min weke din nînin; weke din ji min nayê.
**Ji yekî re gotin; kurê nêzmirî; got; ma hebû nexwar:**
- Ji neçarî bû; weke din derfet tinebûn.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

### Bi kamîreya Stêrk Mihemed




## ‘Rewşenbîr jî tevlî seferberiyê bûne’



Rewşenbîrên kantona Cizîrê tekez kirin ku rewşenbîrên Kurd tevlî seferberiyê bûne û gotin, “Gelê Kurd nas kir ku hebûna wî di metirsiyê de ye. Ne ji mafê Colanî ye ku mersûma 13'an derxîne. Herwiha armanca êrişan ne tenê QSD'ê ye, lê belê derxistina şerê di navbera Kurd û Ereban de ye, divê hemû rewşenbîr ji bo rawestandina şer bixebitin.” **R-9**

## ‘Jiyana li dibistanan zehmet e û pêwîstiya me bi alîkariyê heye’



Koçberên Efrînê ku sê car in koçbder dibin û niha li dibistanên bajarê Qamişlo bi cih bûne diyar kirin ew gelek zehmetiyan di jiyana li dibistanan de dibînin û pêwîstiya wan bi gelek pêdiviyên jiyanî heye.**R-7**

**Çanda Satî**
İsyan Karadenîz R-2



**Tofana Nûh dest pê kir**
Hafiz Ahmet Turhalli R-7

## ‘Dîktatorî aramî û demokrasiyê bi xwe re nayîne’



Rojnamevan E.Pêjder Altan diyar kir ku di Rojhilata Navîn de dewleta Tirk ji bo destkeftiyên gelê Kurd ji holê rake pêşengiya siyaseta qirkirinê dike, bi taybet li Rojavayê Kurdistanê vê yekê pir eşkere dide meşandin.**R-5**

## Berxwedanî û israra jina azad wê biserbikeve



Çawa ku di 2014'an de li Kobanê DAIŞ ji tililiyên jina azad ditirsiyan û paş de vedikşiyan wê niha jî careke din ji berxwedaniya jinan û israra wan li ser jiyanek bi rûmet vekêşin.**R-2**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1347 1-Sibat-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# SERKEFTINA KOBANÊ A 2014’AN WÊ CAREKE DIN TACÎDAR BIBE

Bajarê Kobanê ji 18'ê Çileyê ve û heta niha bi êrişên çeteyên hikumeta demkî re rû bi rû ye û di bin dorpêçeke dijwar de dijî ku rasterast bandorê li jiyana zêdetirî 600 hezar kesan dike. Çeteyên ku êrişî Kobanê dikin hîn hêrsa şikestina hevkarên wan yên DAIŞ'ê di dilê wan de ye û dixwazin tolê rakin. Li hemberî êrişan jî, gel û şervan bi biryardariyeke mezin, bi ruhê berxwedana Kobanê a 2014'an bajarê xwe diparêzin.**R-4**




## ‘Yekrêzî bingeha misogerkirina projeya niştîmaniya Kurdî ye’



Sekretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko diyar kir ku Rojavayê Kurdistanê di rewşeke zehmet û hestyar de ye û got, “Em berxwedana şervanên Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi rûmetdarî silav dikin û careke din piştgiriya xwe ji Hêzên Sûriyaya Demokratîk(QSD) re tekez dikin."**R-6**

## Alîkariyên tên pêşkêşkirin barê koçberan sivik dike



Hevserokê Heyva Sor a Kurd Dilgeş Îsa diyar kir ku jimara koçberên derbasî Cizîrê û Kobanê bûne 200 hezar kes in û got, “Em bi hevkariya dezgeha Xêrxwazên Berzanî alîkariyê li ser koçberan belav dikin, alîkariyên ku tên belavkirin jî tenê ji aliyê gelê Kurd ve hatiye şandin."**R-3**

# Berxwedanî û israra jina azad wê biserbikeve

Çawa ku di 2014'an de li Kobanê DAIŞ ji tililiyên jina azad ditirsiyan û paş de vedikşiyan wê niha jî careke din ji berxwedaniya jinan û israra wan li ser jiyanek bi rûmet vekêşin.

**Stêrk Mihemed/Kobanê**



Jinên Kurd, bi taybetî Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), di şerê li dijî DAIŞ'ê de bi berxwedan, fedayitî û giyana azadiyê roleke dîrokî lîstin. Wan ne tenê çek rakirin, lê hişmendiya qirkirinê têk birin û bûn sembola şoreşê, ku di rizgarkirina herêmên wekî Kobanê, Dêra Zor, Reqa, Tepqa û di gelek herêmên din de roleke çalak û pêşeng lîstin.

**Bi berxwedanî û pêşengtiya jinan wê serkeftin rêya me be**

Jinan bi damezrandina YPJ'ê re, di hemû qonaxên şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê de cih girtin û bûne hêza sereke ya parastina jin û gel. Armanca wan ne tenê têkbirina çeteyan bû, lê belê tunekirina hişmendiya sed salan a qirkirin û qetilkirina jinan bû. Jinan bi berxwedaneke bê hempa û giyana fedaî, di şerên giran de mohra xwe li serkeftinê xistin.
Çeteyên DAIŞ`ê di 15`ê Îlona 2014`an de bi amadekariyeke mezin êrîşî bajarê Kobanê kirin. Şervanên YPJ`ê û YPG`ê ku bi armanca parastina xaka Rojavayê Kurdistanê hatibûn birêxistinkirin, xwe li hemberî êrîşan kirin mertal û Kobanê parastin. Ev serkeftin piştî berxwedana 134 rojan di 26`ê Çileya 2015`an de hat ragihandin. Rêxistina DAIŞ'ê ku weke xetertirîn ji rêxistinên terorê di sedsala 21`emîn de tê binavkirin, li bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê piştî berxwedana bi pêşengiya jinan têk çû.
Di berxwedandiya Kobanê de jinên di bin sîwana Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ku di 4`ê Nîsana 2013`an de hat demezrandin, xwe birêxistin kirin û pêşengiyeke mezin di şer de kirin. Şervanên YPJ`ê li aliyekî fermandarî kirin û li aliyekî din canê xwe kirin mertal û çalakiyên fedayî weke Arîn Mîrkan û Rêvana Kobanê pêk anîn. Têkoşîna jin ya dîrokî ku di berxwedana Kobanê de pêş ket, weke girîngtirîn destkeftiyên jinan di sedsala 21`emîn de tê pênasekirin.

**Ji tililiyên jinana ditirsin**

Gava ku DAIŞ'ê dest bi êrişên hovane li ser Kobanê kirin, jinên kurd çekên xwe hilgirtin û xwe parastin. DAIŞ'ê li xwe mikur dihatin, digotin 'gava me tilîliyên jinan dibihîst, em ji aciz dibûn û ditirsiyan.' Nedixwestin bi destê jinan bimirin. Lê jinên Kurd ew bi destê xwe kuştin. Ji bo vîna jinan bişikînin bi çekên giran êriş dikirin lê wan liberxwe dan û serkeftin kirin armanca xwe.
Erdogan, digot 'Kobanê ket û li ber ketinê ye.' Gava Erdogan wiha got, jin bêtir hêrs bûn û bêtir berê xwe dan eniyên şer. Ji bo Erdogan neghêje armanca xwe, bi ruh û can warê xwe parastin û Erdogan negihaşt armanca xwe. Jinan, li vir bi hezaran çete kuştin. Berxwedana jinan ji Kobanê gihaşt seranserê cîhanê. Di şexsê Arîn Mîrkan, Rêvana, Destîna, Hêlîn, Vîyan, Renîn û Rûkenê de têkoşîna jinê ya li Kobanê li seranserê cîhanê hat bihsîtin. Lehengiyeke mezin hat nîşandan. Ya ku li girê Miştenûrê di nava çeteyan de xwe teqand hevala Arîn Mêrkan bû. Ji bo teslîmgirtin û qirkirina kurdan çi dikin bila bikin lê dê kurd serî netewînin. vîneke wan ya pir xurt heye. Kobanê, bi xwîna şehîdan hatiye avdan. Nêzî çar mehan bê navber xwîn herikî. Wê hertim gelê Kobanê keleha berxwedanê biparêzin û xwedî li destkeftiyên xwe derbikevin.

**Dayîk mil bi mil li kêlekî şervanan bû**

Ji zarokan bigire heya kesên bi temen mezin ji bo parastina warê xwe ketin nava tevgerê û herikîn kolanan. Kêlî bi kêlî di nava tevger û seferberiyê de bûn. Dayîk li kêleka kurên xwe di eniya şer de bûn û bi hevre parastina warê xwe dikiri. Dayîkan çek hilgirtin ser milên xwe û daketin qadan herwiha di milek din de jî xwarin ji şervanên YPJ'ê û YPG'ê re amade dikir û di nexweşxaneyê de jî bi bijîşkan re dibûn alîkar. Ev dayîkên Kurdin ku mil bi mil bi zarokên xwe re di eniya pêş de ne bi yek armancê şer dikin ku parastina axa xwe û parastina destkeftiyên şoreşê. Dayîkên Kurd bi tililiyan zarokên xwe dispartin axê û pê serbilind bûn ku ji ber welatê xwe gihaştine asta şhadetê.
Berxwedan û sekina jinan di Kobanê de dihişt ku DAIŞ bitirse û paş de vekişe, zihniyeta DAIŞ'ê ya paşverû bawernedikir û qebûlnedikir ku jin di qada leşkerî û di çeperenan de cihê xwe bigire ji bo wan şer û heram bû.
Dayîk, jinên ciwan û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) di rizgarkirina Kobanê ji DAIŞ'ê roleke sereke lîstin, ji ber ku berî wan çeteyan di milê leşkerî de têk bibin zihniyeta wan a paşverû ku li hember jinê bikartanîn têk birin. Herwiha jinên Kurd û berxwedaniya wan a li hember DAIŞ'ê di Kobanê tevahî cîhanê de deng veda, çalakiya fedayî ya Arîn Mêrkan li cîhanê bû rojev, ji hêz û cesereta jinê bandor bûn herwiha xwastin ku Yekîniyên Parastina Jin (YPJ) nasbikin ji ber ku rêxistina DAIŞ'ê ya ku herî xeter di cîhanê de têk birin.

**Careke din dixwazin vîna gelê Kobanê têk bibin**

Niha jî careke din berxwedana Kobanê xwe dubare dike, kîna têkbirina DAIŞ'ê bi destê jinê di Kobanê de hîn bi wan re maye, ji ber vê yekê Kobanê kirine nava dorpêçê. Îro ji bi navê hikumeta demkî a Sûriyê êrişê Kobanê dikin, lê tu cûdahiyan wan ji zihniyeta DAIŞ'ê nîne, heman tevger û terzê bikartînin lê belê nav hatiye guhertin û ji aliyê hin dewletên alîkar û bi taybet dewleta Tirk ve hatiye fermî kirin û bi destekê wan kirasê xwe ya DAIŞ'ê guhertine. Ev zêdeyî hefteyekê ye ku Kobanê di nava dorpêçek mezin de ye, herwiha êriş li ser Kobanê berdewamin, çateyên hikumeta demkî dixwazin vîna berxwedan gelê Kobanê ya ku di cîhanê de hatiye îsbatkirin îmha bikin. Di heman demê de dixwazin hêzê jina Kurd têk bibin, lê sekin û têkoşîna YPJ'ê û YPG'ê dibe bersiv ji wan re ku îradeya gelê Kurd nayê şikestin.
Ji roja destpêkê ya êrişa û dorpêça li ser Kobanê ji jinên ciwan heya jinên bi temen mezin çek hilgirtine ser milên xwe û daketina kolanan ji bi parastina weletê xwe bikin. Bi şev û roj jinên berxwedêr di nava tevgerê de ne û lê kêlaka şervanên YPJ'ê mil bi mil ji bo parastina destkeftiyên şoreşa Rojavali qadane. Herwiha di milek din de xwarin ji şervanan re amade dikin û xwedî li keda wan derdikevin. Belê ev der Kobanê ye û ev in jinên Kurd ku giyana xwe dikin oxira jiyanek azad û parastina welat. Herwiha çawa ku di 2015'an de berxwedana jinên Kobanê li hember DAIŞ'ê bi serket vê niha jî bi berxwedanî û hestên azadiyê li hember çeteyên hikumeta demkî bi serbikevin, ji ber ku hemû jin û gelê Kurd biryar dane ku "Yan Jiyanek Azad, Yan Mirinek Bi Rumet".

**Akademiya Jîneolojî**

## Çanda Satî

İsyan Karadeniz

Çîrokên mîtolojîk ku di destpêkê de bi devkî dihatin veguhastin, hêdî hêdî vediguherin baweriyên civakî, kevneşopiyan, pergaleke hiqûqî ya ku ji hêla mêran ve serdest e, û bi pêşketina avahiyên dewletê re vediguhere qanûn û rêziknameyan. Kurteya çîrokeke dirêj di berdewamiya hebûna pergala koletiyê de ye ku îro jiyana me dagirkiriye.
Peyva "sati" ji peyva Sanskritî "Sat" (सत्) tê. "Sat" tê wateya rast, rastî û fezîletê, lê berevajî wê, asat , tê wateya xeyal, derew û bêdemîtiyê. Sati bi rastî tê wateya "jina heyî" an "jina exlaqî". Têkçûna jinekê ji mirina mêrê xwe sax bimîne û bi wî re were şewitandin, nîşana herî bilind a fezîlet û dilsoziyê ye. Bi vî awayî, jinek ku rîtuela sati pêk neyne wekî asati tê binavkirin, ku tê wateya "ne tu tişt. Du formên bingehîn ên rîtuela sati hene: Sahmarna , ku jinek di nav 24 demjimêran de piştî mirina mêrê xwe bi zindî tê şewitandin. Ya din Anumarana ye, ku jinek piştî derbasbûna demek diyarkirî bi tiştên mêrê xwe re zindî tê şewitandin. Di her du pratîkan de jî, jiyana jinê bi jiyana mêrê xwe ve girêdayî ye. Ev pratîk ne tenê bûye rîtuela piştî mirinê, lê di heman demê de bûye rîtuela sembolîk ku girêdayîbûna mutleq a laş û nasnameya jinê bi mêran re nîşan dide.
Rewşa civakî ya jinan ne tenê di asta takekesî de, lê di heman demê de di asta avahîsaziyê de jî bi normên ku ji hêla mêran ve serdest in, tê avakirin.
Lobola li Afrîkayê, drahoma (bihayê bûkê) li Hindistan, Pakistan, Bangladeş û Nepalê , baad li Afganistanê û berdel di civaka Kurdan de hemî formên sazûmanî yên karanîna jinan wekî objeyên danûstandinê, di danûstandinên malbatî de ne.
Her çiqas kevneşopiya satiyê bi Hindûîzmê ve were naskirin jî, pênaseya hebûna jinan bi rêya mêran di gelek çandan de bi awayên cûda xwe nîşan daye. Xwekuştina jinên jinebî li Çîn û Japonya, Sê Prensîbên Dilsoziyê (îtaetkirina bav, mêr û kur) di hînkirinên Konfuçyus de, qanûnên Zen, Zêr û Zemin (jin, dewlemendî û erd) li Afganistan û Pakistanê, û pîrozkirina hesp, jin û çekan di çanda Tirkî de hemî nîşaneyên heman paradîgmaya bavsalarî ne.
Her çiqas çanda satiyê ya kevneşopî îro bi awayekî fîzîkî ji holê rabûbe jî, di nav sîstema kapîtalîst de bi awayên cûrbecûr berdewam dike. Em bi şêweyekî nû yê satiyê ya dilxwaz re rû bi rû ne, ku bi destwerdanên li ser laş û xuyangê jinan, emeliyatên kozmetîkî û normên bedewiyê ve hatî şekilkirin. Pîvanên bedewiyê yên ku li ser mêran disekinin, zextê diafirînin ku laşê jinê bi berdewamî ji nû ve were şekilkirin. Her çend jin bawer bikin ku ew "azadiya" xwe bikar tînin da ku destwerdanê di laşên xwe de bikin jî, ev destwerdan di rastiyê de tenê dubarekirina normên ku ji hêla mêran ve serdest in in. Li kêleka emeliyata plastîk, fitness, çanda parêzê, lênêrîna çerm û hilberên kozmetîkî bi berdewamî laşê jinê wekî "ne bêkêmasî" û projeyek ku "divê çêtir were kirin" nîşan didin. Çawa ku jinan di demên berê de xwe ji bo mêrên xwe feda kirin, niha jin di bin zextê de ne ku laşên xwe biguherînin û xwe ji nû ve ava bikin. Çanda satî yê ku dihişt jin zindî zindî werin şewitandin û werin qurbanî kirin iro bi şeklekî dîtir li ser jin tê ferz kirin. Ger jin bikevin vê ferqê dikarin xwe ji vê kevneşpiyê rizgar bikin û di nasnameya jina azad de xwe mina Zumrûdû Anka ji xweliyên xwe ava bikin.



# Rageşî di navbera Îran û Emerîkayê de ber bi qûnaxeke kirîtîk ve diçe

Herêma Rojhilata Navîn di hefteyên dawî de şahidê tevgerên leşkerî yên berbiçav ên Emerîkî bûye ku asta fikarên Washingtonê li ser zêdebûna rageşiya bi Îranê re nîşan dide, di demekê de ku pêşketinên bilez ên herêmî û metirsiyên ewlehiyê zêde dibin.

**Navenda Nûçeyan**



Li gorî çavkaniyên leşkerî û medyayê, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê komek ji hêzên leşkerî yên bi kalîte şandiye herêma operasyonên Fermandariya Navendî ya Emerîkayê (CENTCOM), bi armanca xurtkirina astengkirinê û rehetkirina hevalbendan, di heman demê de şandina peyamên zelal ji Tehranê re.

**Floteke deryayî û keştiyeke balafiran a nû ji bo herêmê têne şandin**

Di destpêka van tevgeran de, filoyeke deryayî ya din a Emerîkî ber bi Rojhilata Navîn ve çû, di nav de gihiştina keştiya balafirhilgir a (USS Abraham Lincoln) û koma wê ya êrişê, herwiha keşteyên wêranker û krûzerên bi pergalên parastina hewayî û mûşekan ên pêşketî.
Keştiya balafirhilgir yek ji giringtirîn amûrên hêza Emerîkî ye, ji ber şiyana wê ya pêkanîna operasyonên hewayî yên dijwar û lêdana hedefên bejahî û deryayî peyda dike, li gel rola wê ya giring di astengkirina leşkerî û bersiva bilez a her êrişke muhtemel.

**Xurtkirina li ser erdê û belavbûneke deryayî din**

Di heman demê de bi hebûneke deryayî re, çavkaniyên leşkerî hatina nêzîkî 5 hezar û 700 leşkerên din ên Emerîkî bo herêma operasyonên "CENTCOM"ê piştrast kirin, di gavekê de ku amadebûna şer zêde dike û nermbûnek mezintir dide fermandariya Emerîkî di birêvebirina her sînaryoyek awarte de.
Herwiha Tevgerên leşkerî şandina sê keşteyên peravê yên Emerîkî bo herêmê dihewîne, keşteyên ku ji bo xebitîna di nava avên kêm kûr û ewlekirina rêyên deryayî yên hesas hatine çêkirin, bi taybetî Tengava Hormuzê, ku damarek giring ji bo bazirganiya enerjiya cîhanî ye.

**Pira hewayî û pêdiviyên lojîstîkî**

Piştgiriya leşkerî ne tenê bi leşkerên şer ve sînordar bû; balafirên veguhastina leşkerî yên giran ên ku kelûpelên lojîstîkî û alavên leşkerî hildigirtin jî hatin dîtin ku ber bi baregehên Emerîkî yên li Rojhilata Navîn ve diçin. Ev çalakiya lojîstîkî ya dijwar amadekariyên demdirêj nîşan dide, ne tenê tevgerek sembolîk an demkî.
Pisporên leşkerî dibînin ku xurtkirina şiyanên lojîstîkî nîşaneyek sereke ya cidîbûna her bicihkirina leşkerî ye, ji ber ku ew domdariya operasyonan û şiyana hêzan ji bo tevgerîna bilez û bi bandor misoger dike.

**Peyamên serdestiya hewayî û astengkirinê**

Li ser eniya hewayî, çavkaniyan şandina balafirên şer ên F-15 Eagle yên zêdetir ên Emerîkî bo herêmê ragihandin, ku di nav balafirên herî bibandor de di mîsyonên serdestiya hewayî û êrişên dûr ne.
Ev bicihkirin peyameke zelal a astengkirinê hildigire, di demekê de ku tirsa êrişên ku berjewendiyên Emerîkî an hevalbendên wê hedef digirin zêde dibe, çi bi êrişên rasterast an jî bi rêya wekîlên herêmî.

**Çarçoveya herêmî ya tevlihev**

Ev tevger di çarçoveyek herêmî ya pir aloz de tên, ku bi hevgirêdana pirsgirêkên ewlehî û siyasî, ji bernameya nuklerî ya Îranê bigire heya pevçûnên vekirî li gelek deveran, ji bilî zêdebûna rageşiyê li rêyên deryayî, tê xuya kirin.
Her çiqas Washington idîa dike ku hebûna wê ya leşkerî armanc dike ku aramiya herêmî biparêze û azadiya navîgasyona deryayî misoger bike jî, Tehran van xurtkirinan wekî bilindkirinek û provokasyonek rasterast dibîne.
Her çiqas Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê hewl dide hevsengiyê di navbera astengkirinê û pêşîgirtina li ber pevçûneke berfireh de çêbike jî, pirs ev e ku gelo ev hêzên xurtkirî dê di kêmkirina rageşiyê de biserkevin, an jî ew ê herêmê ber bi qonaxeke hesastir ve bibin.
Di encamê de, kombûna leşkerî ya heyî ya Emerîkî asta fikarên li ser rêça aloziyê nîşan dide, herwiha piştrast dike ku Rojhilata Navîn di hesabên ewlehiya neteweyî ya Emerîkî de wekî qadeke navendî dimîne, di demekê de ku cîhan temaşe dike ka rûbirûbûna nerasterast a di navbera Washington û Tehranê de dê bibe sedema çi.
Li gorî Rojnameya Wall Street Journal ji çavkaniyên agahdar veguhestiye ku Îran, tevî ku ji hiliwşîna aborî, zextên siyasî û leşkerî dikişîne jî, hîn jî xwediyê yek ji mezintirîn mûşekî li Rojhilata Navîn e, ev yek jî şiyanek giring dide wê ku gefê li hedefên herêmî, di nav de yên di nav Îsraîlê de, bixe.
Li gorî rojnameyê, Tehran xwedî 2000 mûşekên Balîstî ne, ku dikarin bigihêjin deverên cûda yên herêmê û li hedefên dûr ên heta Îsraîlê bixin.

**Kapasîteyên deryayî û hewayî yên fikardar in**

Li gorî raporê, ji bilî mûşekên Balîstî, Îran xwedî cebilxaneyek mezin ji mûşekên Krûz ên dijîkeşteyan, herwiha qeyikên torpîdo yên bilez û hejmareke mezin ji dronan e, ku rasterast gefê li keşteyên Emerîkî û hevalbendên wan ên li herêmê dixwin.
Ev şiyanên hevbeş dibin sedema ku Tehran li seranserê Rojhilata Navîn êrişên bi bandor bide destpêkirin, di rewşa her êrişeke rasterast a Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê li dijî wê de dê îhtîmala zêdebûna bilez a şer zêde dike, her çend Serokê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê Donald Trump tekez kiriye ku ew dixwaze hêzê bi awayekî "biryardar û sînordar" bikar bîne bêyî ku bikeve nav pevçûneke herêmî ya berfireh.

**Mûşekên parastinê**

Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê sîstemên parastina asmanî yên pêşketî, di nav de Patriot û THAAD, li deverên cuda yên herêmê bi cih dike û ji bo pêşbînîkirina her êrişeke muhtemel a Îranê, dixebite ku bicihkirina wan xurt bike.
Lêbelê, pispor destnîşan dikin ku ev sîstem dê bi dijwariyeke berfirehtir û tevlihevtir re rû bi rû bimînin ji ya ku Îsraîl di dema pevçûna leşkerî ya bi Îranê re di Hezîrana borî de pê re rû bi rû ma, ji ber berfirehbûna armanc û deverên ku divê werin parastin.
Ajansa nûçeyan ya Îranê Tasnim ragihand ku şaxên cûda yên artêşa Îranê komek ji 1000 dronan wergirtine, di demekê de ku alozî zêde dibin piştî gefên Serokê Emerîkayê Donald Trump ên ji bo êrişekê ger Tehran red bike ku bigihîje rêkeftineke nuklerî.

**Rageşî ber bi qûnaxeke kirîtîk ve dice**

Rageşiya di navbera Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê û Îranê de ber bi qonaxeke krîtîk ve diçe, di demekê de ku rojnameya Îsraîlî (Maarif) texmîn dike ku êrişa Emerîkî dibe ku di nav çend demjimêran an rojan de çêbibe, di çarçoveya asta amadebûn û amadekariyên Emerîka û Îsraîlê ji bo îhtîmala pevçûneke berfireh a herêmî.
Tevî nebûna piştrastkirinên dawî derbarê dema êrişê an neçarbûna wê de, çend nîşane destnîşan dikin ku ev sînaryo li ser maseyê ye.

**Helwesta Îsraîlê**

Heman Rojname dibêje ku li ser rewşa Îsraîlê, hêzên hewayî hem ji aliyê parastinê ve û hem jî ji aliyê êrişê ve di rewşa amadebûnê de ne, di demekê de ku Îsraîl bi fermî hewl dide ku nekeve nav pevçûneke rasterast bi Îranê re. Lêbelê, Til Ebîb ji Washingtonê re ragihand ku ew ê bi tundî bersivê bide her êrişeke rasterast a Îranê, nemaze ger ew êriş ji hêla mûşekên Balîstî ve were hedefgirtin.

**Kordînasyoneke ewlehî berfireh**

Di vê çarçoveyê de, serokê beşa îstîxbarata leşkerî ya Îsraîlê serdana Washingtonê kir, li wir agahiyên ku ji bo aliyê Emerîkî giring hatine binavkirin, da.
Herwiha di navbera Fermandariya Navendî ya Emerîkayê û berpirsên payebilind ên leşkerî yên Îsraîlê de, di nav de Serfermandarê Giştî û Fermandarê Hêzên Hewayî, hevdîtinek pêk hat.
Rojname îdia dike ku amadekariyên Îsraîlê ne tenê bi Îranê ve sînordar in, lê di heman demê de îhtîmala çalakiya hevalbendên wê yên li herêmê jî dihewîne. Îsraîl asta amadebûna xwe li bakur û başûr bilind dike û tekez dike ku ew dikare bi lez bersivê bide gefên muhtemel ên ji Yemen, Iraq, an Sûriyê, ji bilî eniya Lubnanê.

# ‘Tevlîbûna me ji berxwedana Rojava re erkekî netewî ye’

Gimo Mihemed Rojnamevanê ku ji Başûrê Kurdistanê derbasî Rojava bû, tekez kir ku li Başûr û cîhanê berxwedana Rojava gelê Kurd kir yek û got, “Di vê kêliyê de beriya ku em rewşenbîr, rojnamevan û karker bin em Kurd in û divê em xwedî li Rojava derkevin."

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Bi destpêkirin û vejîna Berxwedana Şoreşa Rojava re ku ev car naşbe tu berxwedanên din yên di dîrokê de hatine jiyan kirin; gelê Kurd li car aliyên cîhanê ji bo piştgirî û parastina xak û destkeftiyên Rojava bi rojan e li ser piyan e. Bi vê berxwedaniyê re piştgiriya Başûr û Bakurê Kurdisatnê cihê balkêşiyê û serbilindbûyînê bû. Gelê Bakurê Kurdisatê bi rojan li ber sînor man da ku derbasî Rojava bibin, lê mixabin siyaseta Trikiyê, rê neda ku gel û ciwan derbas bibin. Di heman demê de sekna Başûrê Kuridstanê ku bi sedan gel û ciwanan ji Silêmaniyê û hin bajarên din berê xwe dan Rojava û derbas bûn, seknekî bi rûmet bû.

Bi kerwanên alîkariyê yên ku hatine şandin, gelek ciwan û gelê Başûr derbasî Rojava dibin. Herwiha xwepêşandan û piştgiriya gelê Kurd li her derê bi rihê parastin û xwedîderketina li Rojava didome. Li ser wê bingehê Rojnameya me bi Rojnamevan Gimo Mihemed ku li gel gropên ciwanên derbasî Rojava bûne



hatiye, hevdîtinek pêk anî.

**‘Ji bo Rojava her kes bi rihê Kurdîtiyê serîrakiriye’**

Gimo Mihemed di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser berxwedan û yekgirtina gelan ji bo Rojava û wiha pê de çû: “Piştî banga Rojavayê Kurdistanê ji seferberiyê re, em bi ciwanên Başûrê Kurdistanê re derbasî Rojava bûn da ku xwedî li vê seferberiyê û berxwedaniyê derkevin. Hejmareke pir baş ji rewşenbîr, mamoste, sînameger, şanoger û rojnamevan derbasî Rojava bûn, ev yek jî cihê serbilindiyê ye. Bi derbasbûna me ji Rojava re her kes bi armanca tiştê ku li ser gel bi armanca qirkirinê tên kirin, bi cîhanê re parve bikin. Di heman demê de gel li Başûr li zanîngehan û kolanan ji sivîl û karmendan bigre hemû li ser piyan e xwepêşandanan dikin. Divê em viya bînin ziman ku ev yekemîn car e tu ferq di navbera Bakur, Rojava, Rojhilat û Başûr de nîn e, her kes bi yek rihê bi rihê Kurdîtiyê serîrakiriye. Bi rastî ez nikarim ferq û cudatiyê bikim nav kesekî de. Rih û hîsa ku li vê derê tê jiyankirin, li wê derê jî bi heman rih û hîsê ye.”

**‘Parastina Rojava erkekî netewî ye’**

Gimo di berdewamiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Derbasbûna min ji bona Rojava ne bi mebesta ku ez rojnamevan im da ku kar bikin an jî vîdyoyekî parve bikim. Hatina me bi armanca piştgiriya gelê xwe û li kêleka gel seknandine. Di asta yekemîn de ev erkekî netewî ye ez dikim, piştre ez dikarin ji bo xebatê xwe yê rojnamegerî û ragihandinê bikaribin tiştekî bikim. Dema ez dîmenên berxwedaniya gel an jî dîmenê şervaneke Kurd digrim, ez bi armanca ku ka ev dîmen bi çi awayî dikare bibe malê gelê Kurd, çiqas wê bikaribe coşa gelê me û mesaja me bighîne cîhanê, digrim.”

**Yekbûna ragihandina Kurdistanê**

Gimo bilêv kir ku hemû destgehên ragihandina Başûrê Kurdsatnê bi yek helwest û armancê nêzî vê pêvajoyê dibin û got: “Tişta balkêş ku çawa ragihandina Rojavayê Kurdistanê li ser yek xetê xebat dike, di vê pêvajoyê de ragihandin û medyaya Başûr jî bi heman armancê derket pêş. Hemû televezyon, rojnamevan, ajans û radyo Sirûda niştîmanî, srûda şoreşgerî lê didin. Bi berdewamî hemû çapemenî li ser Rojavayê Kurdistanê kar dikin û bangawaziya cîhanê dikin ku ev yek dibe xaleke veguherînê di guhertina dengeyan de.”

**‘Armanc ji vir ber bi Başûr ve ye’**

Gimo di axaftina xwe de da zanîn ku djmin ezmûn û projeya gelê Kurd hedef digre û wiha pê de çû: “Ji ber wê jî em dizanin ku ezmûna Rêveberiya Xweser ezmûnekî cuda ye. Li Rojhilata Navîn du ezmûn hene ku fedralî pêk bê, yek ezmûna Hikumeta Herêma Kurdisatanê ye, ya din jî Rêveberiya Xweser e. Dijmin niha dixwaze Projeya Rêveberiya Xweser têk bibe û piştre berê xwe bide Hikumeta Başûrê Kurdistanê, ji lewra divê piştgiriya gelê Rojavayê Kurdistanê di her alî de bê kirin da ku hebûna gel û projeya wê neyê tune kirin. Pêwîste ku em Kurd li Rojhilat, Başûr û Bakur bibin yek û ji bona parastina xaka Rojava li hember dijmin bibin yek.”

Rojnamevan Gimo Mihemed wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Tu her çi bî, li gel dijmin, tu Kurdî bê ku ferqê bike navbera kesî de. Beriya ku em rojnamevan bin em Kurd in. Bi rastî em pir kêfxweş in ku hemû hevalên me yên rojnamevan li Amed, Hewlêr, Silêmanî û Rojava bi hev re li ser yek armancê kar dikin. Em bi hêvîne ku her wisa hevgrtina rojnamevan û ragihandina Kurdî ji bo gelê Kurd berdewam bike.”

# Jinên Qamişlo bang li jinên kurd dikin ku tevlî berxwedaniyê bibin

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Jinên bajarê Qamişlo tevlîbûna xwe ya ji berxwedaniyê re ragihandin û pabendbûna xwe ya ji bo parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava tekez kirin û wiha gotin: “Em ê têkoşîna jina azad û Kurdê azad ji bo avakirina Rojava, çi fedakarî be bila bibe, bidomînin.”**

Di 18`ê Çileya 2026`an de Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî êrişên çeteyên hikumeta demkî ya Sûriyeyê, dewleta Tirk a dagirker û şaneyên DAIŞ’ê yên li ser herêmê banga seferberiyê kir.

Hebûna jinên Qamişlo di seferberiyê de, wekî yek ji nîşaneyên herî berbiçav ên berxwedanê derdikeve pêş. Di nav aloziyên ewlehiyê, zextên siyasî û xirabûna şert û mercên jiyanê de, jin li kêleka bûyeran neman, lê belê xwe di navenda tiştê ku dikare wekî berxwedanek berfireh were binavkirin de dîtin, berxwedanek ku ji çekan wêdetir diçe parastina civak, nasname û mafan e. Girêdayî vê mijarê jinên Qamişlo Semîra Hac Elî û Emîna Hesarî ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Bi berxwedanê em ê perdeya Qirkirinê bişkînin’**

Jina bi navê Emîna Hesarî diyar kir ku Îro roja yekîtîya hemû Kurdan e û wiha got: “Wê Kurd, jin, ciwan û extiyar, bi giyanekî hevpar ê serhildana neteweyî, hemû êrîşên qirkirinê pûç bikin. An em bi rûmet û nasnameya xwe bijîn, an jî kujerên bi zanebûn dê cîhanê bi kuştina me veguherînin rastiyek qirêjtir ku kes nikare tê de bijî. Bi vê hişmendiyê, em ê xweparastinê bikin û em ê têkoşîna jina azad û Kurdê azad ji bo avakirina xwe, çi qurbanî be bila bibe, bidin meşandin. Bi tevlîbûna seferberiya giştî û parastina destkeftiyên şoreşa me, ku bi saya qurbanîdana bi hezaran şehîdan hatine bidestxistin û bi dilsoziya xwîna şehîdên me û gelê me, ez piştrast dikim ku ez ê ax û gelê xwe biparêzim çi berdêl be bila bibe. Ev êrîşên ji aliyê çeteyên hikûmeta demkî



Emîna Hesarî

li ser Rojava tên kirin hewldanek e ji bo qirkirina gelê Kurd û bidawîkirina hebûna wan li ser axa wan.

Rojava Kurdistan e, ji ber vê yekê, em bang li hemû partî û tevgerên Kurd, rêxistinên jinan û hemû gelê xwe dikin ku seferber bibin û çembera agir a parastinê ava bikin. Divê em fêm bikin ku ketina Rojava tê wateya ku êrîşa qirkirinê dê li seranserê Kurdistanê belav bibe. Em bi kêliyek dîrokî ya girîng re rû bi rû ne û divê em bi berxwedana gelê Kurd re ji bo cihê xwe yê rewa di sedsala 21”an de rûbirûyê vê êrîşê bibin. Bi berxwedanê, em ê perdeya qirkirinê bişkînin û bi ser bikevin, herwiha em ê ti çarenûsek ferzkirî an planeke alternatîf qebûl nekin. Ez bang li hemû jinan, gelê xwe, gelên



Semîra Hac Elî

cîhanê, şoreşgerên navneteweyî û jinên ku ji bo azadiyê têdikoşin dikin ku tevlî berxwedanê bibin û seferberiyê bibin. Em ê heta kêliya dawiyê bi hemû şiyanên xwe li kêleka gelê xwe bin.”

**‘Em ê nehêlin rûmeta me bê binpêkirin’**

Semîra Hac Elî anî ziman ku Jina azad, mirovê azad û nasnameya Kurd a azad ku li ser rêya Rêber Apo ava bûye, teslîmbûnê qebûl nake, xwe nade kesî û dizane ku berxwedana bi hêza xwe yekane rêya rizgariyê ye û wiha got: “Li ser vê bingehê, divê gelên cîhanê û jin bi ruhê Kobaniyê li dora şoreşa Rojava bibin yek û li dijî siyaseta qirêj rawestin. Divê jin, bi helwesta siyasî ya gelê Kurd, li dora şoreşa Rojava xelekek ji agir çêbikin û bi ruhê 15’ê Sibatê dest bi berxwedanê bikin û nîşanî cîhanê bidin ku hêza wan a rastîn berxwedan û rûmeta azadiyê ye. Kiryarên çeteyan ên li dijî hin şervanên jin ên Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) û jinên azad ên Kurd ên dîlgirtî di medyayê de hatine weşandin, tu hêz nikare van jinên ku xwe rizgar kirine û azadiya gelê xwe bi dest xistine, rezîl bike. Gelê me yê berxwedêr li Rojava nirxa me ya herî mezin e, hêstirek ji çavên zarokên me sedemek ji bo berxwedanek bêdawî û hesabpirsînek neçar e. Em ê nehêlin rûmeta me were binpêkirin, li ser vê bingehê divê jin refên berxwedanê pêşve bibin, bibin hêza hesabpirsînê. Şoreşa Rojava, li hember hemû xerabiyên sîstema dewletê û tarîtiya ku hêviya azadiyê difetisîne û di bin pêşengiya Rêber Apo de, wekî qada azadiyê hate avakirin û rehên wê li ser ked, bawerî û pêşengiya jinan hatin danîn û ji bo jinan, ji bo gelê Kurd û ji bo hemû gelan veguherî nirxek hevpar, herwiha divê ev şoreş jî berdewam bike.”



# Alîkariyên tên pêşkêşkirin barê koçberan sivik dike

Hevserokê Heyva Sor a Kurd Dilgeş Îsa diyar kir ku jimara koçberên derbasî Cizîrê û Kobanê bûne 200 hezar kes in û got, “Em bi hevkariya dezgeha Xêrxwazên Berzanî alîkariyê li ser koçberan belav dikin, alîkariyên ku tên belavkirin jî tenê ji aliyê gelê Kurd ve hatiye şandin."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Heva Sor a Kurd ji 6`ê Çileyê ve û heya roja îro ji bo koçberên ku berê xwe dane kantona Cizîrê û birîndaran ne rawistuya ye. Di nava gef û êrişên ku li ser Rojava tên kirin, Heyva Sor a Kurd bi hemû hewledanên xwe di nava kar û xebat de ye, herwiha bi hevkariya dezgeha Xêrxwazên Berzanî alîkariyê li ser koçberan belv dikin û dixwazin bi ruhê Kurdîtiyê barê koçberan sivik bikin.

Li gor agahiyên Dezgeha Xêrxwazên Barzanî ku ji Başûrê Kurdistanê hatiye alîkariyên mirovî û tenduristî ji koçberên bajarên Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê yên li bajarê Qamişlo pêşkêş dikin. Ev yek di çarçoveya sivikirina zehmetî û êşên malbatên ji ber koçberiyê zirar dîtine de, pêk tê. Dezgehê serdana gelek navendên koçberan ên li bajêr û gundewarê wê kir. Tîmên Tibî yên dezgehê nexweş kontrol kirin, derman û şîr li zarokan belav kirin, li kêlek wê jî bi hevkariya Komîteya Sotemeniyê ya bajêr mazot jî belav kir.

Di derbarê mijarê de hevserokê Heyva Sor A Kurd Dilgeş Îsa ji Rojnameya me re axivî.



**‘Hedefgirtina tîmên tendirustiyê sûcên şer e’**

Dilgeş Îsa di dstpêka axaftina xwe de diyar kir ku di şeran nabe tîmên tendrustiyê werin hedefgirtin û wiha domand: “Heyva Sor a Kurd di destpêka êrişên li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşfrefiyê de gelek caran bangewaziya seknanadina şer ji bo gihandina alîkariyan ji gelê wan taxan re kir, ji bo ku hêzên çekdar yê hikûmeta demkî gelek nexweşxaneyên ku sivîl tê de tên dermankirin hatin hedefgirtin. Di ti şerî de nabe tîmên tendirustiyê ango nexweşxane werin hedifgiritin, ji ber ev dibe sûcên şer yên herî xeternak. Lê me dît ku çawa çeteyên hikumeta demkî û dagirkeriya Tirk her kes û her tişt kir hedef û mîna hovan êriş kirin. Ruxmî ewqas gef û êrişan jî hewildanên Heyva Sor a Kurd jî di vê çarçoveyê de hebû ku ev êrişên hovane li ser sivîlan were seknandin û alîkarî bighêje wan. Tevî êrişên dijwar yên hikûmeta demkî em ranewestiyan û me alîkariyên tendrustî ji bo birîndarên Taxan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi du ambolansan gihandin heya deriyê Dêrhafirê, lê ji ber ku rê hatibûn girtin me nikarî bû ku derbas bibin. Lê me hewldanên xwe kir da ku wan birîndaran derbasî cihekî bi ewle bikin. Di 10`ê Çile de ew birîndarên her du taxan derbasî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn.”

**‘Nêzî 200 hezar kes koçberî kantona Cizîrê û Kobanê bûn’**

Hevserokê Heyva Sor a Kued Dilgeş Îsa di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser hijmara koçberan û alîkariya ku hatiye pêşkêşkirin û wiha pê de çû: “Şer her roj dijwartir dibû û gihişt herêmên Firatê giştî, bi vê yekê gel carek din rastî Koçberiyê hat. Gelê me yê ku berî niha rastî koçberiyê hatine, hijmara wan pir mezin bû û dema şer gihişt heya derdorî bajarê Hesekê hemû gel koçberî bajarê Qamişlo û heya ber sînorê Sêmalka li Dêrikê bûn. Hijmara koçberan pir mezin e di asta ku wek Rêveberiya Xweser û Heyva Sor jî nikarî bû vî barî rake. Rastî di vî şerî de gelek alozî û gef li ser sivîlan ji aliyê çeteyên hikûmeta demkî ve hatin kirin. Niha di vê demê de li bajarê Qamişlo û hemû bajarên Rojavayê Kurdistanê koçber di Dibistan, mizgeft û holên mezin de hatin bi cihkirin, herwiha gelê bajaran bi xwe jî deriyê xwe ji xelkê koçber re vikirin û her malbatek nêzî du malbat û sê malbat hewandine. Hijmar hîn nehatiye zelalkirin lê xelkê ku derbasî van herêman bûye nêzî 200 hezar kes e. Ji van nêzî 45 hezar kes ber bi bajarê Kobanê ve çûn û niha jî bajarê Kobanê di dorpêçê de ye û şerek dijwar derdora wê heye. Hêviya me ew e ku ev gelê ku koçber bûne ji bo wan hewildan werin kirin da ku tendrûrstiya wan saxlem bimîne. Ji xwe ev alîkariyên ku niha ji Kurdên me yê Başûrê Kurdistanê derbasî Rojava dibe ev bo me cihê serbilindahiyê ye. Ji destpêka êrişan û koçberiya dawî çêbû, em û dezgeh û kenalên li Başûrê Kurdisatn bi awayekî hevpar û komînal alîkariyê belav dikin. Alîkariya hatî tenê ji aliyên Kurdan ve bû.”

**Bîlancoya dawî ya alîkariyên Dezgeha Barzanî ya Xêrxwaziyê ev in:**

- Hijmara kemiyonên alîkariyê yên ku derbasî Rojava bûne 255 in
- Hijmara karmendan 478 in

**Bîlancoyên alîkariyên cihreng:**

- Hijmara malbatên ku alîkarî wergirtin 7 hezar û 475 in
- Hijmara dibistanan 160 in
-Hijmara mizgeftan 9 in

**Bîlancoya alîkariya sotamaniyê:**

- Hijmara malbatên ku mazot wergirtin 6 hezar û 850 in
- Belavkirina qaseya sotemaniyê ji koçberan re 241 hezar û 632 litr e.
- Hijmara dibistanan ku sotemenî lê hatiye belavkirin 178
- Hijmara mizgeftên ku sotemenî lê hatiye belavkirin 19 .

**Bîlancoya xwarina gerim:**

- Xwarina germ li ser 25 hezar û 589 kesan hatiye belavkirin.
- Hijmara dibistanên ku xwarina germ lê hatine belavkirin 69 in.
- Hijmara mizgeftên ku xwarina germ lê hatine belavkirin 5 in.

**Bîlancoya tîmên tendirustiyê:**

- Hijmara malbatên ku alîkariyên tenduristiyê wergirtine 3 hezar û 541 malbat in.
- Hijmara dibistanên alîkariyên tenduristiyê lê hatine belavkirin 47 in

# ‘Me jiyan ne dît, me tenê şer û koçberî dît’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Koçberên li Qamişlo diyar kirin ku hin koçber heya niha tu alîkarî ji wan re nehatiya pêşkêşkirin û gotin, “Zarokên me ji serma nexweş ketine, pêwîst e rêxistinên aleqedar bi erkên xwe yên mirovî rabin.”**

Weke tê zanîn piştî êrişên çeteyên HTŞ`ê û dagirkeriya Tirk li ser Reqa û Tebqayê koçberên Efrînê yên li kampan bûn berê xwe dan bajarê Qamişlo. Rêveberiya bajar li gorî derfetên xwe koçber bicîh kirin û alîkariyê belav dike. Herwiha alîkariyên ku ji Başûrê Kurdistanê gihîştiye Qamişlo li koçberan tên belavkirin. Lê ji ber ku hejmara koçberan zêde ye û sermayek dijwar heye bûyerên bi êş tên jiyankirin û heya niha hin malbatên koçber hene ku alîkarî ji wan re nehatiya pêşkêşkirin. Li Qamişlo piraniya dibistanan ji bo koçberên ku piraniya wan xelkên Efrînê ne, dibistan hatine vekirin. Lê pêdiviyên wan yên jiyanî pir kêm in, bi taybet ava vexwarinê, cil û amûrên germkirinê.

Di daerbarê mijarê de koçberên Efrînê yên ku li bajarê Qamişlo bicih bûne ji rojnameya me re axivîn.

**‘Em di gelek zehmetiyan jiyan dikin’**

Koçbera bi navê Nezîra Çolaq di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku heya niha ti rêxistinan li rewşa wan nepirsiye û wiha got: “Koçberiya Efrînê sala 2018`an bû. Em li Şehbayê heft salan di bin çadiran de man. Helbet pir zehmet bû, baran bû, serma bû, germ bû. Piştî wê em derketin em hatin Reqayê. Li Reqayê jî êriş çêbû, êriş jî ji aliyê çeteyên hikumeta demkî û dagirkeriya Tirk ve hat kirin. Di dema dawî de dema me xwest ji Reqa û Tebqa derkevin da ku em berê xwe bidin bajarên bi ewle, çeteyan êrişî koçberan kirin û erebên me bombebaran dikir. Heta ku gelek ji koçberan birînadar bûn, heya niha gelek kes di nava me de hene li erdê ne, ji ber birînên xwe nikarin rehet tevbigerin. Niha jî em hatine bajarê Qamişlo, zarokên me ji serma nexweş ketine, ne soba ne jî mazot heye. Heya vê satê tu



Nezîra Çolaq



Mihemed Hisên



Reşmal Reşo

rêxistinên alîkariyê nehatine cem me û rewşa me nedîtine. Em di nava gelek zehmetiyan de ne. Ji ber vê yekê em bang li hemû rêxistinên mirovî dikin ku çarekê ji me re bibînin û van zarokan ji mirinê dûr bixin.”

**‘Berxwedan Jiyana’**

Koçberê bi navê Mihemed Hisên jî behsa jiyana jiyana koçberiyê kir û wiha got: “Jiyana koçberiyê gelek dijwar û zehmet e. Pirsgirêka sereke em dibînin ku sermayekî pir hişk heye û cihekî ku em xwe lê gerim bikin tune ye. Heya niha piranî ji me di erebeyên xwe de û li ber vê sermayê xew dike. Heya kengî em ê di vê rewşê de bin. Bila hin rêxistinên alîkariyê werin reşa me bibînin. Ev zêdeyî 15 rojan em li vir in, lê tu kes rewşa me ne pirsiye, em jî mirovin û pêdiviyên me û zarokên me bi jiyan kirinê heye. Ma heya kengî em ê bibêjin wê çêbibe û em tiştek nabînin. Her em berxwe didin, her em bi diruşmeya Berxwedan Jiyane em dijîn. Lê kêleka vê berxwedaniyê pêwîste hin kes li te û rewşa te mêze bikin. em dîsa dibêjin berxwedan jiyana, em ê heya dawî li ber xwe bidin. Banga me jî ji hemû saziyên mirovî heye ku bi erkên xwe yên mirovî û exlaqî ve rabin.’

**‘Me jiyan ne dît, me tenê şer û koçberî dît’**

Di heman demê de zarokek koçber a bi navê Reşmal Reşo ku 8 salî ye bi dilekî şewat anî ziman ku çi sûc û sedema heye ew û hevalên xwe ji dibistan û siberojê qut bibin û wiha pêde çû: “Me jiyan ne dît, tişta ku me di vê jiyanê de dît, şer û koçberî bû. Her wiha heya roja îro em di rewşa koşberiyê jiyan dikin. Dema ku em zarokan dibînin diçin dibistanê û di nava dermê û malên xwe de. Li vir em xwe lêpirsîn dikin. Çima em jî ne wisa, me çikiriye hey ku jiyan wiha bi me re bêbexte. Êdî em jî dixwazin di nava jiyanekî aram û saxlem de bijîn. Em şer û koçberî nema dixwazin. Bi hêvî me ku ev dewletên li ser hisabên me berjewandiyên xwe dimeşînin, bila êdî wijdanê wan bi êşe ku pêşeroja me zaroka winda dikin.”

# Çeteyên ku di 2014’an de li Kobanê têkçûn, îro wê dorpêç dikin

Gel û şervanên Kurd li Kobanê di nava agir û dorpêçê de berxwedana 134 rojan careke din vejîn kirine, çete bi awayekî dijwar êrişî Kobanê dikin, ji ber hêrsa şikestina hevalên wan yên DAIŞ'î hîn di dilê wan de ye, lê gel û şervanên Kurd bi biryardayeke mezin dibêjin; “Em Kobanê bernadin, me doh DAIŞ têk bir, em ê îro hevalên wan jî têk bibin."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Hikumeta demkî çiraya kesk li Parîsê ji dewletên navneteweyî bir ku êrişî Rojavayê Kurdistanê bike. Li ser wê bingehê di 6’ê Çileyê de li ser Helebê, bi taybet taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê re ku piryaniya wan Kurd lê bûn, êrişên hovane pêk anî, karîsatên nayên texmînkirin rû dan, dîsa pêla koçberiyê ya gelê Kurd da ser rê û ber bi herêma Rêveberiya Xweser ve rê ketin. Lê armanc ne tenê Heleb û taxên Kurdan bû, herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yan jî em bêjin Rojavayê Kurdistanê di plane de ye. Lewma piştî destserkirina Helebê çeteyan berê xwe dan Dêr Hafir. Li Dêr Hafir lihevkirin pêk hat ku hêza leşkerî ya Rojava YPG, YPJ û QSD’ê xwe jê vekişîne, lê weke her car ku em dizanin Colanî xapînoke, ji ber çeteyên wî hîn vekişandina hêza Rojava bidawî nebû êriş kirin, gelek ji şervanan êsîr kirin. Di heman demê de çeteyên Colanî berê xwe dan bajarên din wekî Reqa, Tebqa û Dêra Zorê, êriş ne tenê çeteyên Colanî pêk tîne, lê bi destekdayîna rasterast a dewleta Tirk ku êrişên asîmanî û bejahî jî bi çeteyên Colanî re pêk tîne. Li van bajaran jî li gorî lihevkirinên di navbera QSD’ê û hikumeta demkî ya Sûriyê Colanî de QSD’ xwe vekişandin. Li kêlek van hemû kiryaran jî, van çeteyan hevkarênDAIŞ li Şedadê û gelek deverên din berdan û hîna jî cihê ku ew lê ne dixwazin wan berdin.

**Mertalên zindî li Rojavayê Kurdistanê kolan bi kolan e**

Colanî û Tirkiyê bi niyeta xwe ya nebaş hewldana dagirkirina hemû Rojavayê Kurdistanê dike, lewra kantona Cizîrê û Kantona Firatê niha di nava şer û berxwedaniyê de. Gelê Kurd li seranserî cîhanê di seferberiyê de ye. Kurdan biryara mirin û berxwedanê, berî serî tewandinê dane. Ji kal û pîran heyanî zarokan kolan bi kolan çek girtine ser milan û li pêşiya van çeteyan bûne mertal.

**Li Kobanê hevalên çeteyan DAIŞ têk çû ew kî ne têk neçin**

Tişta ku dijmin û neyarên me hêrs kiriye Kobanê ye ku ev zêdeyî heftiyekê derdora wê hemû dorpêç kiriye, hemû pêdiviyên jiyanî jê qût kirine, internêt, elektirîk, xwarin, av, pêdiviyên bijîşkî û hwd… Lê Kobanê berxwedana 134 roja dîsa




xistiye dewrê de. Arîn û Egîdên wê dîsa rabûne, di nava orta agirê dijminan de comerdî û berxwedaniyê didin meşandin, dibêjin bela em bişewitin lê, em Kobanê bernadin. Em Kobanê bernadin, me doh DAIŞ têk bir, em ê îro wan jî têk bibin.

Niha li Kobanê zarok ji serma jiyana xwe ji dest didin, nexweşxane ber bi aloziyeke mezin ve diçe. Eynî sala 2014’an lê tê. Cîhan bi taybet neteweyên yekbûyî ji bîr nekin 2015’an şervanên Kurd we ji DAIŞ xelas kir, îro win bi xwîneke sar li hemberî van çeteyan bêdeng mane. Gelê Kurdistanî bi ruhê Kobanê daketine cenga azadiyê, xelasiya Kurdan Kurd bi xwe ne. Bi dirûşmeya ‘Gelê Kurd Yek e’ wê Kobanê çavê çeteyan derxîne.

**Binpêkirina agirbestê û dewamkirina şer ji aliyê çeteyên Colanî ve tê kirin**

Ji bo herêma Kurdan agirbest heta 15 rojan hat dirêjkirin, lê niha êrişên dijwar ji aliyê çeteyên Colanî li ser Kobanê û Cizîrê têne kirin, her ew binpêkirina agirbestê dikin, dewletên garantor di nava vê agirbestê de dest girêdayî ne, hebûn û nebûna gotina wan yeke.

**Kurdan sînga xwe dane ber guleyan û Kobanê rizgar kirin**

Kurd ne ji bo planên dewletan jiyan dikin, Kurd ên azadiyê ji cîhanê re şîrove dikin û li ser erdê pêk tînin. Ên doh hatine xwe kirine xwediyê vê axê, 2014’an li kur bûn. Tenê şervanên Kurd di cengê de sînga xwe dane ber guleyan û Kobanê rizgar kirin. Yan wê Kurdistan bi serkeftina Rojava re bibe yek, yan wê Kurd di jenosida sedsaliyê re bibin qurban.

# Bi xwînê destan têne nivîsandin

**Azê Dalaho**

Demsal zivistane, lê li welatê me li şûna berf û baranê li ser gelê Kurd ê sivîl bombe û mûşek dibarin. Xwîn li nav cokan li şûna ava baranê diherike. Zarokên welatê min li nav Heleb, Loristan, Îlam û Kirmaşanê berxwedaniyê dikin, rûbirûyê tundiya neyarê zordar tên. Neyarê xwînxwar û despot bi sedsalan gelê me di nav pencên xwe de destgîr kirine.

Lê wan xayîn, sîxur û neyaran ji bîr ve kirine ku gelê Kurd weke berê nîne. Kefenê xwe çirandine, her li ser piyane û li ber xwe didin. Bi ser gelê Kurd ê berxwedêr de dijminatî û çete dibarin. Mebesta wan ew e gelê me di nava golên xwînê de bixeniqînin û dawiya wan bînin. Lê weke ku min li jor jî got gelê Kurd êdî biryara jiyana azad û wekhev daye, hew jê dizivire.

Teqez wê qeder jêre ronahiyê bîne û deriyê serkeftinê veke.

Bi sedê salan e li ser gelê me qirkirin û înkar heye. Her kes vê pir eşkere dibîne. Tevî vê jî hemû cîhanê çavên xwe girtiye û rola sê meymûnan dilîzin. Vê carê jî xwîna gelê me li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê mîna avê herikî û bi xwe re golek çêkir. Hemû cîhanê şahidî kir bê ka çawa du dewletan dehhezaran çetên xwe yên tundrew, bi çekên herî giran û balafirên bê mirov ên keşfê li mirovên bêçek dan. Gelek malbat bi komî hatin qetilkirin.

Bi tank, top û mûşekan êrîş kirin. Gelek zarok û jin şehîd û birîndar bûn. Malên wan bi ser wan de anîn xwarê. Hîn jî gelek mirov wenda ne. Evqas hêz û çek ne li hemberî welatekî bû! Tenê li hemberî du taxan bû ku ew tax jî tijî mirovên sivîl bûn. Neyar ewqasî ji gelê Kurd ditirsin ku êrîşên mînaka wê nehatine dîtin dikin, wan bi tang û topan dikujin. Rast e vîna vî gelî ewqasî mezin e ku dewleta Tirk a hêza duyem a NATO ye û hikûmeta veguhêz a Şamê jî di nav de bi ewqas hêz û çekan êrîş kirin.

Tirsa wan tundrewan hinde mezin e ku bi bêşermiyeke mezin bi zêdetirî 40 hezar çeteyan êrîşî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Lê bila serxweşiya serkeftinê nejîn. Ji ber ev ji bo wan binketineke pir mezin bû. Ji bo wijdanê razayî yê mirovahiyê jî şermeke wê ti carî neyê jibîrkirin. Ma qey wê dîrok pirsa vê neke? Ma ji wijdanê razayî yê mirovahiyê wê hesab nexwaze?

Gelê me û hêzên wan ên ewlekariyê yên berxwedêr careke din nîşan dan ku em ti car teslîmiyetê qebûl nakin û bi xwîna xwe rûpelên dîroka têkoşer dineqişînîn.

Helebê û hemû cîhanê jî heybeta gelê me û qehremanên me dît. Destana van qehremanan wê di dilan de were nivîsandin û wê bibe roniya çavan. Ev soza me ye wê Rojavayê welat şewqa rojê di dilê xweda rohnî bike û cîhanê tarîtiyê xelas bike.



# ‘Rewşenbîr jî tevlî seferberiyê bûne’

Rewşenbîrên kantona Cizîrê tekez kirin ku rewşenbîrên Kurd tevlî seferberiyê bûne û gotin, “Gelê Kurd nas kir ku hebûna wî di metirsiyê de ye. Ne ji mafê Colanî ye ku mersûma 13'an derxîne. Herwiha armanca êrişan ne tenê QSD'ê ye, lê belê derxistina şerê di navbera Kurd û Ereban de ye, divê hemû rewşenbîr ji bo rawestandina şer bixebitin."

**Navenda Nûçeyan**

Êrişên çeteyên girêdayî hikumeta HTŞ’ê li ser gelê Kurd tên domandin, di domdariya êrişan jî seferberî li dar e, civak bi tevahî li ser asta Rojava, Kurdistan û her devera ku Kurd lê dijîn tevlî seferberiya ji bo parastina destkeftiyên Rojavayê Kurdistanê bûn. Di heman çarçoveyê pirsa ku dihat kirin ew bû ku rola rewşenbîran di vê seferberiyê de çi bû û ew xwedî çi helwestê bûn. Derbarê helwesta rewşenbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê nivîskar Pêşeroj Cewherî û Ebûd Mexso ji rojnameya me re axivîn.

**‘Armanc ne tenê QSD’ê ye, derxistina şerê navxweyî ye’**

Ebûd Mexso destnîşan kir ku ne tenê QSD’ê armanca şer e lê belê derxistina şerê di navbera Kurd û Ereban de ye û wiha got: “Di dema heyî de bi rûdana van geşedanan em dibînin ku hemû hêz di serî de dewleta Tirk dixwazin Rojavayê Kurdistanê bixin çemberê. Ev êrişên ku li ser Rojavayê Kurdistanê tên kirin di çarçoveya planeke navdewletî ye. 11 sal li ser rizgarkirina Kobanê derbas dibin, ew berxwedaniya ku li hemberî çeteteyên DAIŞ’ê hat kirin. Di hemdemiya salvegerê de êrişeke pir giran bi hemû cûreyên çekan li ser Kobanê tê kirin. Kobaniya ku rûmeteke ji bo gelê Kurd û hemû cîhanê ji ber ku li vê derê teror hat bidawîkirin û li vir ewlehiya cîhanê hat parastin. Ev êrişên ku li ser Rojavayê Kurdistanê tên domandin tê wateya ku armanc ne tenê QSD, YPG û YPJ’ê ye, lê belê parçebûna gelên herêm ji hev e. Bi van êrişan dixwazin tevlîheviyê di herêm de bidin avakirin û vî şerî bikin şerê Kurd û Ereban. Divê gelê Kurd şiyar be û aqilmend, zane û serokeşîrên Ereban nehêlin şerê navxweyî rûbide. Tişta ku ji serokeşîrên Kurd û Ereban tê xwestin ew e ku nehêlin şer berfireh bibe, ji ber ku eger şer berdewam bike wê encamên xerab bên dîtin. Çendîn şer bibe jî wê herî dawî lihevkirin çêbibe, ji ber vê yekê jî divê ji destpêkê ve şer rûnede.”

**‘Mersûma 13’an ji sedî 1 daxwazên gelê Kurd pêknayîne’**


Mexso diyar kir ku mersûma 13’an ji sedî 1 daxwazên gelê Kurd pêkanîne û wiha domand: “Mersûmê ku ji hêla serokê hikumeta demkî Ehmed Elşer ve hat derxistin xwedî ev armanc bû ku li pêşiya civaka navdewletî bide pêş û bêje cara yekemîn e di Sûriyê de Kurd tên naskirin. Herwiha ew ê bibin xwedî nasname û her heftiyekê wê du caran waneyên zimanê Kurdî li dibistanan bibînin, hem jî kesê ku bixwaze tevlî bibe û kesê nexwaze tevlî nabe, yan jî Cejina Newrozê wê bibe cejinke fermî. Ev mersûm ji sedî 1 daxwazên gelê Kurd pêknayîne, ev yek têrê nake, lê weke destpêk gaveke erênî ye, divê em li ser vê gavê xweşik û tekûz bisekine piştre bizanibe berfireh bike û datayên wê derxîne. Mersûm dibêje bile di heftiyê de du seet waneyên zimanê Kurdî hebin, em dibêjin ji dêvla vê yekê bila dibistanên Kurdan bi destên wan werin rêvebirin. Bi vî rengî tu pirsgirêk dernakevin em neteweke resen in di vî welatî de û ji mafê me ye ku ev yek pêkwere. Dijmin dixwaze gelê Kurd û QSD’ê ji hev cuda bike, lê qet ev yek pêkan nabe, ew jî vê rastiyê dizanin. Bi van êrişên ku hatin rûdan 70 melyon Kurd li seranserî cîhan û Kurdistanê kirin yek, di roja îro de jî dilên Kurdan bi hev re lêdide, ew bûne yekdest û yekdoz.”

**‘Divê rewşenbîr dengê xwe bigihînin hemû cîhanê’**

Nivîskar Ebûd Mexso wiha bang li rewşenbîrên Kurd dengê xwe bigihînin hemû cîhanê ji bo rawestandina şer kir: “Cara yekemîn e di dîrokê de ku yekrêziya gelê Kurd bi vî rengî çêdibe, bi awayekî rojane danûstandin, têklî û diyalog di nabera hemû aliyên Kurdistanî de çêdibe. Em dibînin ku piştgiriyeke cîhanî ji bo Rojavayê Kurdistanê tê raberkirin, ev gaveke herî pîroz e ku tê kirin. Seferberiyê yekîtiyeke girseyî ya gelê Kurd çêkir û Kurdên li tevahiya cîhanê li hev kom kir. Banga min ji bo hemû rewşenbîrên cîhanê, Rêveberiya Xweser, hikumeta demkî, herwiha aliyên ku nirxên mirovahiyê di ber çavan re derbas dike ew e ku bibin dozdarê rawestandina şer. Dem ne dema şer e, dem dema diyalog û lihevkirinê ye. Divê hemû gelên li Sûriyê di nav welatekî demokras de bibin xwedî maf, bi vî rengî em ê bikaribin bi hev re bijîn.”



Ebûd Mexso



Pêşeroj Cewherî

**‘Ne ji mafê Colanî ye mersûma 13’an derxîne’**

Pêşeroj Cewherî tekez kir ku ne ji mafê Colanî ye ku mersûma 13’an derxîne û wiha bi lêv kir: “Wekî em dizanin ku Colanî ne serokekî bi hilbijartinan hatiye ser desthilatdariyê. Di zagonê de jî ne ji mafê wî ye ku mersûmekê derxîne ji ber ku ew serokekî demkî ye. Ev mersûmê 11’an girêdayî çanda Kurdî ye, Ehmed Elşeri dibêje zimanê Kurdî ne zimanekî fermî ye, dibêje zimanekî neteweyekê li Sûriyê û tê pê axaftin. Ev tê wateya ku ji mafê gelê Kurd tenê li mala xwe û kolanê bi Kurdî biaxive, nayê naskirin weke zimanekî perwerdeyî. Li gorî vê mersûmê gelê Kurd tenê dikare dîlana xwe bigerîne, çalakiyên rewşenbîrî li dar bixe û hwd… ev gav di demekê de hat ku gelê Kurd rastî êrişên Colanî dihat. Hikumeta HTŞ’î gelekî kirasê xwe diguherîne, ew hikumeteke teror a guhêrbar e. Mixabin gelek kesayet ji nava gelê Kurd bi rengekî erênî li vê mersûmê dinerin. Başbûna vê mersûmê di kîjan aliyê wê de ye, biryarnameya 13’an weke ku dijmin axê bixe çavê gelê Kurd de da ku nema bibîne. Biryarek wiha ji serokekî demkî nabe cihê baweriyê, ji ber ku Colanî di dema bê de dikare mersûmeke din derxîne û bêje ez mersûma 13’an tune dikim. Di nerîna min de ev mersûm pêkhat da ku vê hevgirtina gelê Kurd a li hemberî kiryarên Colanî ji hev bikeve.”

**‘Rewşenbîr heya radeyeke baş tevlî seferberiyê bûne’**

Nivîskar Pêşeroj Cewherî tekez kir ku rewşenbîrên Kurd tevlî seferberiyê bûne û wiha bi dawî kir: “Weke tê zanîn Genêrala Mezlûm Ebdî bangewaziya seferberiyê kir, li ser vê bangê jî her kes ji hêla xwe ve tevlî bû, tu cudahî di navbera hêza leşkerî, rewşenbîr, saziyên rewşenbîrî û saziyên ragihandinê de nema tê dîtin. Ji ber ku şer li ser hebûna gelê Kurd e, êdî Kurdan nas kir ku pilanên qirkirinê li ser wan tên meşandin. Gelê Kurd li Rojava, parçeyên din û yên diyasporayê tevlîbûna seferberiyê weke erkekê dîtin û avêtin ser milên xwe. Bi nerîna min rewşenbîr li ser bingeha vê bangê tevlî seferberiyê bûn, heya radeyeke baş xebatek ji hêla rewşenbîrên Rojava, yên parçeyên din û diyasporayê ve hat meşandin. Gelê Kurd nas kir ku hebûna wî di metirsiyê de ye, ji ber vê yekê her rewşenbîrek li gorî rewşê tevgeriya. Rewşenbîrên Kurd çi bi helbestan, çi bi nivîsan, li ser mediyaya dijîtal û çi bi semîneran bangewazî ji bo yekîtiya gelê Kurd kirin.”



# Rewşa avê li Qamişlo

Piştî desteserkirina bendava Tişrînê ji aliyê hikumeta demkî a Sûriyê ve, elektirîk bi temamî li ser Kobanê û kantona Cizîrê hat qutkirin. Qutkirina elektirîkê li ser peydakirina avê ji bo welatiyan dibe gef, bi taybet li bajarê Qamişlo ku niha bi deh hezaran koçber lê dimînin.

**Navenda Nûçeyan**

Ji ber êrişên ku hikumeta Şamê li ser xaka Rojavayê Kurdistanê daye destpêkirin, di encama van êrişan de Bendava Tişrînê hate destserkirin ji hêla çekdarên girêdayî wê. Bajarê Qamişlo bi awayekî sereke xwedispêre li ser bendava Tişrînê ji bo stasyonên avê di riya enerjiyê de, lê ji ber destserkrina hikumeta demkî li ser bendavê, ku di encama wê de elktrîk hat qutkirin, di heman demê de encamên xeternak yên rojane li hember şêniyan dê derbikeve.

Bajarê Qamişlo di xebitandina stasyonên avê û bîran de astengiyeke berfireh dijî, piştî windakirina çavkaniyên sereke yên enerjiyê dema kontrola hikûmeta demkî ya Şamê ya li ser Bendava Tişrînê, ku xebitandina pompeyan sînordar kir û kapasîteya hilberînê kêm kir di heman demê de rêk û pêkiya dabînkirina avê ji bo şênî û koçberên li taxên cûda yên bajêr re tehdît kir.

### Bernameya belavkirina avê

Di bin şert û mercên heyî de, Daîreya Avê ya Qamişlo ji bo belavkirina avê di navbera taxên bajêr de, xwedispêre bernameyek pompkirinê ya rast ve, da ku bandorên aloziyan kêm bike û peydakirina gihaştina avê ji bo hejmareke mezin ji şêniyan mîsoger bike, pompkirin li gorî bernameya asayî tê kirin, pompe rojane di navbera devern rojhilat û rojavayê Qamişlo de, ji saet 2'an pê ve, tê guhertin.

Pompekirin ji sê stasyonên sereke li gorî du çerxên rojane yên sereke dest pê dike. Çerxa yekem ji saet 6'ê êvarê heta 10'ê êvarê dirêj dibe, lê çerxa roja din ji saet 8'ê sibê heta 12'ê nîvro dest pê dike. Armanca vê sîstemê ew e ku tevî çavkaniyên sînorkirî, di belavkirinê de astek dadmendî bi dest bixe.

### Bîrên deverên rojhilat

Li gel stasyonên sereke, Daîreya Avê xwedispêre bîrên li devera rojhilatê bajarê Qamişlo, ku niha li ser jeneratorên yedek dixebitin, ji ber sînordarkirinên li ser berdestbûna sotemenî û enerjiyê, ev bîr di rojê de tenê 8 saetan têne xebitandin. Di heman demê de hin bîrên avê li ser enerjiya rojê têne xebitandin, ev niha beşeke giringe ji çareseriyên alternatîf ku daîreya avê hewi ldide ku xwe bispêre wê ji bo kêmkirina zextê li ser toreya giştî.

### Stasyonên pompekirinê yên sereke

Li devera rojhilat sê stasyonên sereke ya pompkirina avê hene ku tora giştî dabîn dikin: Stasyona Avê ya Hilêliyê, Stasyona Avê ya Iwêca û Stasyona Avê ya Ceqceq. Wekî din 13 bîr li seranserî devera rojhilat hatine parvekirin ku bi jeneratorên yedek dixebitin, digel çar bîrên ku bi enerjiya rojê dixebitin. Her çend ev çavkanî giring bin jî, ew di şert û mercên normal de, nemaze di aloziya heyî de, ji bo dabînkirina hewcedariyên rastîn ên bajêr têrê nakin.

### Xeta Sefan

Xeta Sefan yek ji xetên giring e ku avê dide stasyona avê ya Iwêca û ew beşek giring a sîstema veguhestina ava bajêr pêk tîne. Bi awayekî mezin xwedispêre wê ji bo piştgiriya pompkirinê, nemaze di demên lûtkeyê de. Lêbelê, ji ber kapasîteya xebitandinê ya qels a stasyonên pê ve girêdayî, karîgeriya wê kêm bûye.



### Peydakirina avê ya koçberan

Bi zêdebûna pêlên koçberiyê ber bi bajarê Qamişlo ve, aloziyeke din derketiye holê, ew jî dabînkirina ava vexwarinê ji bo koçberan e ku li zêdetirî sed stargehan hatiye belavkirin. Niha, av bi rêya tankerên avê ji van navendan re tê belavkirin, ku ji çavkaniyên avê yên stasyonên avê yên Hilêliyê û Iwêce tên dagirtin.

Ji ber vê yekê odeyeke operasyonên hevbeş hate damezrandin ku ji Daîreya Avê ya Qamişlo, Nivîsgeha Jîngehê, Daîreya Agirkujiyê û hejmarek ji xwebexşên sivîl pêk tê. Ev ode belavkirina avê bi rêya tankeran organîze û hevrêz dike, rojane avê digihîne nêzîkî 50 stargehan, hejmareke ku ji ber hewcdariya rastîn kêmtire bi sedema kêmbûna tankeran û çavkaniyên bedrest.

Daîreya Avê ya Şaredariya Qamişlo hewlên xwe yên mirovî didomîne da ku ava vexwarinê ji koçberan re yên li stargehan peyda bike, bi riya xebitandina tankerên avê bi awayekî rojane. Daîreya Avê xebatên xwe berdewam dike da ku yek ji hewcedariyên herî bingehîn bicîh bînin, bi baweriya ku dabînkirina avê mafek ji bo her mirovî ye û erkek e ku nayê paşguh kirin.

Di heman demê de wekî beşek ji hewldanên xwe yên berdewam ji bo dabînkirina pêdiviyên bingehîn ên koçberan, Şaredariya Qamişlo hejmarek depoyên avê li stargehan belav kirin da ku dabînkirina ava vexwarinê û ava rojane ya domdar û birêkûpêk peyda bike. Ev gav di çarçoveya plana şaredariyê de ye ji bo xurtkirina binesaziya xizmetguzariyan li stargehan û sivikkirina êşa xelkê koçber, tevî dijwarî û şert û mercên dijwar ên ku herêm pê re rû bi rû ye.

### Aloziya elktrîkê ya sereke

Mezintirîn zehmetiya ku Daîreya Avê ya Qamişlo pê re rû bi rû ye, qutbûna elektrîkê ya Bendava Tişrînê ye, ku çavkaniya sereke ya elektrîkê ye ji bo stasyonên avê û bîran e. Piştî ku hikûmeta demkî ya Şamê bendav kontrol kir, dabînkirina elektrîkê bi tevahî rawestiya, ku bû sedema girtina giştî ya stasyonên avê û bîran û rasterast bandor li hilberîna avê kir.

### Stasyona Hilêliyê ya sereke

Stasyona avê ya Hilêliyê stasyona sereke û herî giring a bajêr e. Pirsgirêka wê ya sereke ew e ku jeneratorên yedek ên berdest ji bo xebitandina tevahî ya hemî pompe û bîrên stasyonê têrê nakin.

Wekî çareseriyek qismî, çavkaniyek elktrîkê ya alternatîf (elektrîk bêpere) hatiye peyda kirin, lêbelê, ev çavkanî kapasîteya wê sînordar e û tenê %50'ê hewcedariyên enerjiyê yên xebitandinê yên stasyonê vedihewîne, ev tê vê wateyê ku stasyon bi qasî nîvê kapasîteya xwe dixebite. Ev yek rasterast bandorê li mîqdara ava hilberandî û belavkirî dike.

### Hilberîna bîran kêm bûye

Li deverên rojhilat, li Qamişlo 13 bîr hene ku berê 24 saetan dixebitîn, lê wan jî çavkaniya xwe ya yedek a elektrîkê winda kirine. Niha, ev bîr bi tenê xwe dispêrin jeneratorên yedek, ku xebata xwe di rewşa herî baş de bi heşt saetan di rojê de sînordar dikin. Ev kêmbûna mezin a demjimêrên xebitandinê bûye sedema kêmbûna avê û aloziya berdewam a bajêr girantir kiriye.

### Encam û bandorên giştî

Encama giştî ya van şert û mercan kêmbûneke giran a ava vexwarinê ye, ku rasterast bandorê li şiyana daîreya avê dike ji bo dabînkirina pêdiviyên şêniyên Qamişlo û deverên derdorê. Pêlên koçberiyê yên zêde dibin, di demekê de ku tankerên avê nikarin hemî stargehan bigirin ji ber hejmar û çavkaniyên wan ên sînorkirî.

Di vê derbarê de Daîreya Avê ya bajarê Qamişlo bang li şêniyan kir ku parastina xeckirina avê bikin di riya bikaranîna avê di demên pêwîst de, tekezkirina girtina lûleyên avê, avê bi awayekî ewle û paqij hilînin û di vê dema krîtîk de ji bo armancên nehewce avê bikar neynin.





# 'Dîktatorî aramî û demokrasiyê bi xwe re nayîne'

Rojnamevan E.Pêjder Altan diyar kir ku di Rojhilata Navîn de dewleta Tirk ji bo destkeftiyên gelê Kurd ji holê rake pêşengiya siyaseta qirkirinê dike, bi taybet li Rojavayê Kurdistanê vê yekê pir eşkere dide meşandin. Di sala 2014'an de dewleta Tirk ji bo Şoreşa Rojava bifetisîne li ber çavê hemû cîhanê li dijî gelê Kurd piştgiriya DAIŞ'ê kir. Gelê Kurd li hember çeteyên DAIŞ'ê bi ser ket û pergala xwe ya demokratîk ava kir.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Derbarê geşedanên li Sûriyê û plana hêzên navneteweyî û heremî yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku heta niha didomin, Rojnamevan E.Pêjder Altan, bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**-Hûn êrîşên HTŞ'ê yên li dijî Rojavayê Kurdistanê çawa dinirxînin û li pişt van êrîşan kîjan hêz heye?**

Raya giştî ya cîhanê şahidiyê ji êrîşên çeteyên HTŞ, DAIŞ û dewleta Tirk a di 6 Çileyê de ku li ser taxên Kurdan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê dan destpêkirin û hêj jî berdewam dike. Zêdetirî 42 hezar çete yên ku bi taybetî kordîneya wê ji aliyê serçeteyên DAIŞ'ê ve dihat kirin (Hikûmeta Demkî ya Şamê û dewleta Tirk) bi sedan tang, top, çekên giran, dron û SÎHA'yên aîdê dewleta Tirk bûn êrîş kirin. Li hemberî van bi giştî zêdetirî 300 şervan û gelê taxê bi vîneke mezin û bi awayekê fedayî şer kirin. Piştî vê êrîşê ev komên çete ranewestiyan û êrîşên xwe yên li ser Rojhilatê Firatê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kirin da ku gelê Kurd ji holê rakin. Di vê çarçoveyê de ji Tişrîn, Dêr Hafir, Meskene û Dêrazorê êrîş dest pê kirin û van êrîşan li ser erdnîgariyeke fireh belav kirin; bi taybetî li ser gelê Kurd û gelên cuda yên etnîk û olî yên li herêmê jî komkujî pêk anîn. Di çarçoveya van êrîşan de, hucreyên razayî û çalak ên DAIŞ'ê jî bi awayekî çalak di van êrîşên komkujiyê de cihê xwe girtin; êrîş li ser Girtîgeha El Eqtan a Reqayê û Girtîgeha Şedadê ya DAIŞ'ê hatin kirin. Bi taybetî li Şedadê, 200 metre dûrî DAIŞ'ê, di bin navê "Hêzên Kiwalisyonê yên li dijî DAIŞ'ê" de hêzên kiwalisyonê çavên xwe girtin û çeteyên DAIŞ'ê serbest hatin berdan. Bêdengiya van hêzên koalisyonê yên navneteweyî yên li dijî DAIŞ'ê, kûrahiya plan û konseptê ya li pişt perdeyê jî nîşan dide.

Di çarçoveyeke plankirî de li herêmê konsepta şerê nû hate afirandin. Ev konsept li ser du xetan tê meşandin: Qonaxa yekem pevçûna Kurd-Ereb û piştre pevçûna Sunnî-Şîe ye, da ku were nîşandan ku hevsengiyên herêmî diguherin. Mîna ku peymana nû ya Sykes-Picot li herêmê were sepandin. Gava yekem a vê peymanê di Hezîrana 2014'an de li paytexta Urdunê Ammanê, bi beşdariya Amerîka, Brîtanya, Tirkiye, Îsraîl, Fransa, di heremê de jî DAIŞ'ê di bin navên cûr bi cûr de hate avêtin. Di destpêka meha Çile ya 2026'an de jî li Parîsê bi "Peymana Parîsê" ev plan hate xêzkirin. Di vê çarçoveyê de li herêmê hêzên nû yên Sunnî-Selefî yên bi Peymana Îbrahîmî re ku bi Îsraîlê re îmze kirine têne afirandin.

**-Li Bakûr-Rojhilatê Sûriyê carekedin çeteyên DAIŞ'ê zindî bûye, gelo xeteriya wê li ser heremê çiqas heye?**

Qonaxa yekem a vê planê ew e ku Hikûmeta Demkî ya Şamê ya ku DAIŞ jî tê de ye, di qonaxa yekem de were xurtkirin û motîve kirin. Ev jî li ser êrîşên komkujiyê yên li ser Kurd, Elewî û Dûrziyan tê kirin. Bi vî awayî çeteyên cîhadîst ên girêdayî Hikûmeta Demkî ya Şamê, yên komkuj û cîhadîst bigihîjin sînorê Iraqê û pevçûna etnîkî bi pevçûna mezhebî bidomînin. Di vê çarçoveyê de bi pêlên êrîşên li ser Iraqê re, êrîş li ser milîsên Heşd Şabî yên di bin bandora Îranê de bên kirin. Bi vî awayî cîhanê dîsa wê dîmenên 2014'an bibîne û gelek çalakiyên DAIŞ'ê yên ku hemû cîhanê biêşînin, wê bibe zemîn. Di vê çarçoveyê de bi mudaxeleya Îranê re, dixwazin Îranê bixin hedefê xwe de, yan jî em ê şahidê pevçûnên mezintir û êrîşên ku li hemû herêmê belavbibin bibînin. Piştî ku Îranê lawaz bikin, parçe bikin an jî hilweşînin, planên sereke yên ku Tirkiye û welatên Kendavê jî tê de bin, bi aborî, leşkerî, erdnîgarî, veguhastin û bandora bazarê re bê bandor bikin, parçe bikin û bê bandor bikin. Ji ber vê yekê hêzên ku îro komkujiyên li ser gelê Kurd wekî serkeftineke mezin dibînin, nizanin ku ew ê ji genimê xwe yê malê jî bibin xwedî. Di vê planê de hêzên ku niha tiliya xwe tê de hene, paşeroja welat û gelên xwe jî tarî dikin. Ji ber vê yekê ev hêzên ku ufqa wan tune ye, bi çalakiyên rojane xwe wekî aktorên çalak ên herêmî û cîhanî dibînin. Lê her pêşkeftineke li herêmê nîşana metirsiya ku nêzîkê wan dibe ye.

**-Geşedanên ku di salên dawî de qewimîne û plana ku hûn qala wê dikin dinêrin, gelo hêzên hegemon di hêla sîstemê de xitimandinekê dijîn, ger wilo be ji bo derbaskirina vê xitmandinê hewil didin gav an jî guhertineke çawa bikin?**

Îro dewletên statukoparêz, qirker û faşîst yek bi yek hildiweşin û hinek jî hatine ber hilweşandinê. Mixabin dema dewletên faşîst hildiweşin



li şûna wan otomatîkî "dewletên demokratîk" ava nabin. Mînakên rejîm û dewletên hilweşiyayî li ber çavê me ne. 1979'an de rejîma Şah li Îranê hilweşiya, di bin navê "şoreşa Îslamî"de rejîmekî xirabtir bû desthilat. Niha ew jî li ber hilweşandinê ye. Li Iraqê rejîma Baas hiweşiya lê belê li şûna wê dewleteke demokratîk ava nebû. Vaye rejîma baas a Suriyeyê hilweşiya, li şûna wê jî dewleteke demokratîk ava nabe. Di xwezaya desthilatdariyên netewdewletperest de faşîzm û dîktatorî heye. Ji ber vê yekê hilweşandina dewletan bi serê xwe azadî, demokrasî û aşitiyê bixwe re nayne, berovajî wê desthilatdariyên dehqat zêde tûnd bixwe re tîne.

Rejîma Baas ya faşîst hilweşiya, lê li şûna wê bi alîkariya hêzên navdewletî û Tirkiyeyê cîhadîstên tundrew yên faşîst li Şamê desthilatdariya xwe îlan kirin. Tiştên ku desthilatdariya HTŞ'ê li Şamê dixwaze pêşbixe ji kiryarên rejîma Baasê pir cûdatir nîne. Ew jî dixwazin wek Baasê îradeya gelê Kurd tune bihesibînin, dewletekî faşîst û dîktator ava bikin.

Pêve girêdayî, ji bo jiholêrakirina Îranê ku wek e asteng li pêşiya projeya rêya IMEC'ê ku dê hegemonya Îsraîlê ava bike û Peymana Birahîm ku dê Ereban bi tevahî bindest bike, gotin di cih de be mirovahî hate qetilkirin. Bi vê yekê ku HTŞ'ê ji vê rewşê hêz girt, pêşî Esed ji desthilatdariyê daxist, dû re jî li dijî Durzî, Elewî û Xiristiyanan komkujî pêk anîn. Di vê navberê de, ji bo gelê heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku dîtin ku wê bi heman rêbazî nikaribin têk bibin, peymana 10'ê Adarê bi neçarî hatin ser masê. Lê belê, ew nekarîn daxwazên dewletên herêmî yên ku hebûna xwe deyndarê wan bûn red bikin. Bi taybetî Tirkiyeyê statuya Kurdan wekî gef didît û daxwaz dikir ku ew bi mafên herî kêm werin parastin. HTŞ'ê ku diviyabû li Parîsê bi QSD'ê re bicive, li şûna wê bi Îsraîlê re rûniştibû, Tirkiye û DYA wekî çavdêr tevdigeriyan. Her çend encam nehatin eşkerekirin jî, li ser erdê eşkere bû ku gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di berdêla qebûlkirina hegemonya Îsraîlê de hatin paşguhkirin.

**-Di nava gengeşeya heyî de rola Tirkiyê çi ye?**

Di Rojhilata Navîn de dewleta Tirkiyê ji bo destkeftiyên gelê kurd ji holê rake pêşengiya siyaseta qirkirinê dike, bi taybet li Rojavayê Kurdistanê ev yek pir eşkere tê meşandin. Di sala 2014'an de Dewleta Tirk ji bo şoreşa Rojava bifetîsîne li ber çavê hemû cîhanê li dijî gelê Kurd piştgiriya DAIŞ'ê kir. Gelê Rojava bi piştgiriya çar parçeyên Kurdistanê, hêzên demokratîk û azadîxwaz li hember çeteyên DAIŞ'ê bi ser ket û pergala xwe ya demokratîk ava kir. Di nav qeyran û kaosa Rojhilata Navîn de pergala li Rojava hat avakirin bû mînakeke bihevre jiyankirina demokratîk a gelan. Rojhilata Navîn a ku di nav Netew-dewletên hişk û statukoparêz de hatibû fetisandin bi şoreşa Rojava re derfeta jiyana demokratîk peyda kir. Modêla pergala Rojava dikarîbû ji bo hemû dewletên rojhilata Navîn bibûya mînak. Rojava nîşanê hemû cîhanê da ku gel û baweriyên cûda dikarin bi hişmendiya Netewa demokratîk bihevre jiyan bikin.

Dewleta ku herî zêde ji destkeftiyên Rojava acize û dixwaze wê ji holê rake dewleta qirker û faşîst a Tirkiyê ye. Hikumeta AKP-MHP û kadroyên wan yên qaşo wezîrin bi ruhê sê paşayên Îtîhad-Terakî tevdigerin. Destpêka şerê cîhanê yê yekemîn de Enwer, Talat û Cemal paşa bi ruhê nijatperestiya Tirkîtiyê xwestin hemû gelên heremê qir bikin. Bi sedhezaran Kurd, Ereb û Ermenî hatin kuştin û ji welatê xwe hatin dûrxistin. Niha kadroyên hikumeta dewleta Tirkiyê bi heman siyaset û ruhî tevdigerin û dixwazin gelê Kurd di qirkirinê re derbas bikin. Erdogan, Hakan fîdan, Yaşar Guler wek sê paşayên bûn sebeba hilweşîna dewleta Osmaniyan, bi dijmantiya gelê kurd tevdigerin û ev dijminatiya hovane dê bibe sebeb ku dewleta Tirkiyê jî hilweşe. Hiş, mejî û çavên van faşîstan ji dijminatiya kurdan pêve tiştekî din nabîne. Sûcên ku ev kesana li dijî gelê Kurd dikin bi faşîzmekî korane dikare were bi navkirin. Ji bo van kesan pênaseya faşîst dibe ku kêm bimîne, lê di wateya sîyasî de bê axlaqiya herî jêr de ne.

Herî dawî li Helebê, li du taxên ku gelê Kurd di navde niştecîhin û jiyan dikin, di pêşengtiya van kesan de êrîşa qirkirina komî dan destpêkirin.

Li dijî gelê Kurd bi kê re hevaltî kirin? Bi çeteyên DAIŞ û bermayiyên wî yên El Kaîde û HTŞ'ê re! Çeteyên bi kê li hev anîn, û bi dewleta Îsraîl, Emerîka û Ewrûpa re dewleta Tirk ji bo gelê Kurd ji holê rake çi ji destê wê hat kir û dike.

**-rûxmê ku çend carin agirbest di navbera QSD'ê û HTŞ'ê de çêdibe lê hêzên HTŞ'ê agirbestê binpê dikin. Niha jî li ser 15 rojan agirbest hatiye ragihand, hûn vê çawa dinirxînin?**

Agirbesta li Sûriyeyê êdî aştî nîne; ew amûrek e ji bo endezyariyê ku têkiliyên hêzê li ser erdê ji nû ve rêz dike. Ev agirbest ji bo Amerîka ji bo serweriya xwe zêde winda neke, ji bo HTŞ'ê jî, karibe ew nakokî û tevlîheviya hûndirîn komî ser hev bike, ji bo dewleta Tirk û hikumeta Demkî ya Şamê jî çeteyên DAIŞ'ê jî di nav de çeteyên xwe di çeperên pêş de bi cih bike û birêxistin bike ye.

Herwiha dema agirbest hate aşkerekirin jî, di bin de HTŞ ji hêzên xwe yên taybet ên ku ne fermî re jî bi taybet çeteyên DAIŞ'ê re hatiye gotin ku ne bi awayek fermî hûn dikarin êrîşê xwe yên lokal berdewam bikin. Êrîşên li aliyê gundewarê Çilaxa û Kobanê tên kirin nîşaneya vê ye. Her wiha pê re jî çeteyên ku ji mêj ve ji aliyê dewleta Tirk ve di bin navê eşîretan hatibûn amadekirin, aloziyan derbixin û gelê Ereb li dijî hêzên QSD'ê bidin rakirin.

**-Nirxandin hene ku dibêjin armanca êrişan ne tenê deskeftiyên Rojavayê Kurdistanê ye, di heman demê de armanc Başurê Kurdistanê û Iraq bi giştî ye. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Her çiqas berê şer û êrişên HTŞ yên li ser Rojava piştî agirbestê dê bi kûve biçe tê nîqaşkirin jî, hêdî hêdî ber bi armanca sereke ve diçe: Ango qada şer a Iraqê. Di vê qadê de destpêkê armanc Haşdî Şabî ye, hêzên wekîl ên li ser erdê bide şerkirin jî DAIŞ û HTŞ ye. Her çend hêzên desthilatdar vê planê gav bi gav pêş dixin jî, hêzên Heşdî Şebî, piştgiriya Îranê û dabînkirina veşartî ya alavên teknîkî ji hêla Çînê ve nîşan didin ku encam dê dijwar be. DYA, bi gavên xwe yên ber bi hegemoniyê û serdestiya Îsraîlê li Rojhilata Navîn, dê careke din Rojhilata Navîn bixe nav tariyê. Ji ber ku ev stratejî dikare di cih de Iraq, Îran, Sûriye û heta Tirkiyeyê veguherîne qada şer. Bandorên vê pevçûnê dikarin wekî kiryarên ku zîhniyeta DAIŞ'ê li welatên Ewropî û DYA nîşan didin, derkevin holê.

# ‘Yekrêzî bingeha misogerkirina projeya niştîmaniya Kurdî ye’

Sekretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko diyar kir ku Rojavayê Kurdistanê di rewşeke zehmet û hestyar de ye û got, “Em berxwedana şervanên Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi rûmetdarî silav dikin û careke din piştgiriya xwe ji Hêzên Sûriyaya Demokratîk(QSD) re tekez dikin.” Herwiha yekrêziya gelê Kurd stûna misogerkirina projeya niştîmaniya Kurdî ye.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Piştî êrîş, komkujî û binpêkirinên li dijî gelê Kurd li Sûriyê û xiyaneta ku li hundir û ser asta navndewletî rû bi rû man, yekîtiya Kurdan bûye bingeha berxwedanê û bidestxistina armanc û daxwazên gelê Kurd. Gelê Kurd bi dehên salan e ji bêedaletî û zordestiyê êş kişandiye. Îro jî di bin desthilatdariya demkî û çeteyên wê de êrîş û komkujiyên li dijî gelê Kurd bi hewldana şikandina îradeya wan û tunekirina wan berdewam dikin. Derbarê rewşa heyî ya êrişên qirkirinê yên li ser gelê Kurd tên meşandin û hevrêziya Krudî sekretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko ji rojnameya me re axivî.





**‘Rojava di rewşek hestyar de ye’**

Ciwan Siko da zanîn ku Rojavayê Kurdistanê di rewşeke zehmet û hestyar de ye û wiha got: “Berxwedan û dilsoziya ku li Rojava Kurdistanê tê domandin hişt ku kevirê bingehîn ji bo yekîtiya gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê were bicihkirin. Berxwedanî bû sedemeke rasterast ji bo xurtkirina rihê yekîtiya neteweyî û xurtkirina hestê Kurdperwerî di warê nivîsîna çarenûsa gelê Kurd bi awayekî hevpar, tevî hebûna sînoran, hem jî erdnîgarî û cudahiyên siyasî. Ev berxwedanî ne li dijî tu gel û civakê bû, lê ji bo parastina hebûn û rûmetê herwiha parastina destkeftiyên ku bi xwîna bi hezaran şehîdên gelê Kurd ên li Rojava hatine bidestxistin, ew şehîdên ku ji bo azadî, aştî û jiyana hevbeş canê xwe feda kirin. Rojava îro di rewşeke hestyar de ye, pêwîstiya me bi hişmendiyeke durist, rêxistin, piştgiriya siyasî û civakî heye da ku serkeftinên ku bi berdêlên giran hatine bidestxistin, biparêzin û mafên gelê Kurd li Rojava misoger bikin. Em hewcedarî têkoşîneke aştiyane ya rewa ne, di vê ev berxwedanî jî li gorî regezên mirovahiyê be. Di heman demê de em xwedî rêzgirtin bin ji mafê her kesî û perensîbên jiyana hevbeş bin.”

**‘Yekrêzî bingeha misogerkirina projeya niştîmaniya Kurdî ye’**

Siko tekez kir ku yekrêziya gelê Kurd stûna misogerkirina projeya niştîmaniya Kurdî ye û wiha domand: “Wekî tê zanîn li ser Rojavayê Kurdistanê êriş tên kirin, bersiva van êrîşan wê bi rêya yekrêzî, hevgirtin, pabendîbûna bi riya aştiyê û redkirina axaftinên nefret û provakasyonê ye. Ji ber ku parastina sivîlan berpirsyariya hemû aliyan e. Yekgirtina hemû aliyên Kurdî rê li ber avakirina hevgirtina siyasî yên domdar vedike, mafên Kurdan bi rengekî mayînde misoger dike. Di heman demê de piştgiriyê dide diyaloga di navbera wan û pêkhateyên din ên Sûriyê de ji bo bidestxistina çareseriyan ji bo tevahiya gelên Sûriyê. Yekbûna Kurdan êdî ne vebijêrkeke siyasî ye yan dirûşmeyeke demkî ye, lê pêdiviyeke niştimanî ya girîng e, ji ber gelek astengî li hemberî gelê Kurd li hemû beşên Kurdistanê derdikevin. Yekîtiya Kurdan îro ji bo parastina mafên Kurdan, xurtkirina berxwedanê û rûbirûmayîna li ber metirsiyên ku hebûn û nasnameya gelê Kurd armanc digire, ewlehiyeke û misogeriyeke. Divê ev yekîtî li ser bingehên diyaloga demokratîk, rêzgirtina dualîtî û naskirina cihêrengiya siyasî û rewşenbîrî, dûrî zimanê tawanbarkirin, îxanet, provakasyon û axaftinên nefretê were avakirin. Di heman demê de em piştrast dikin ku hevgirtina di navbera gelê Kurd de bingeha her projeyeke neteweyî ya serkeftî û mayînde.”

**‘Em li pişta hêza xwe ne’**

Sekretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko diyar kir ku ew ê li pişta QSD’ê bin û wiha bi dawî kir “Armanca sereke parastina mirovan û bidestxistina aştiyê ye. Êrîşên ku li dijî Rojavayê Kurdistanê tên kirin, rasterast gefê li ser ewlehiya sivîlan çêdikin, rewşa mirovî xirabtir dikin û nearamiya li herêmê zêde dikin. Em van êrîşan şermezar dikin û armancgirtina kesên bêguneh û binesaziya herêmê di bin çi hincetê de be, red qebûl nakin. Em xwedî wê baweriyê ne ku çareseriya rasteqîn ne bi tundûtûjiyê ye, lê bi hewldanên siyasî û diplomatîk û xurtkirina yekîtiya cebheya hundirîn in. Em piştgirîya xwe ji Hêzên Sûriyaya Demokratîk(QSD) re tekez dikin, hêzên me berpirsyariyeke mezin di parastina ewlehî û aramiya herêmê de diavêjin ser milên xwe, hem jî parastina gelên me di vê qonaxa dijwar de dibînin erkeka xwe. Em vê fedakariya QSD’ê bi rûmetdarî bi nav dikin, di heman demê de em bi berdewamî tekez dikin ku bikaranîna hêzê divê bi xebata siyasî ya aqlane re be.”

# Alcezîre, Alerebiye û Alhedes... çapemeniya dûrî heqîqetê

**Reşo Mihemed**

Di demeke ku xîtaba nefret û handana mezhebî zêde dibe de ku bûye sîwanek ji êrişên qirkirinê yên sîstematîk ên li dijî pêkhateyên Sûriyê, Kanala Alcezîra a Qetrerî û Kanalên Alarabiye û Alhedes yên Siudî, hem jî saziyên fermî û kesayetên bi ser hikûmeta HTŞ’ê fîtnê û derewan belav dikin û rasterast teşwîqî şer û komkujiyan dikin, herwiha hişmendiya giştî dixapînin û bi zanebûn tevna pirrengî ya Sûriyê derb dikin.Ev sazî hevkarên berovajîkirina bûyeran in, di serî de jî êrişên ku îro li dijî Rojava tên kirin, piştî ku dest ji pîvanên pîşeyî yên rojnamevaniyê berdan, peymanên sincên rojnamegeriyê bin pê kirine û ji ecîndeyên siyasî re bûn alavên fîtne û kîndariyê. Li şûna ku bi yekaîlî bûyeran binere, bişopîne û derxîne ji raya giştî re, ew xîtaba nefret û sorkirinê ranawestînin. Ew dûrî rastiyê nebêalîbûnê nakin bingeha xebata rojnamegeriyê. Ev yek kete rojevê dema ku rêjîma Baas çû û li şûna wê hikumeta HTŞ’ê cihê xwe di desthilatdariyê de git. Wekî tê zanîn ev her sê kenal bi taybet ji destpêka aloziya Sûriyê ve bi gelemperî di serdema hukimê Baas de li gorî siyaseteke taybet dimeşiyan, ew jî dijbertiya rêjîma Baas bû, aliyên din wekî Rêveberiya Xweser û QSD’ê hem jî rastiya Şoreşa Rojava dernedixist. Devera ku şoreşa rasteqîner hebû, ev kenal çavên xwe jê digirtin. Carcaran wijdanên kenala Cezîre, Erebiye û Erebiye Elhedes diliviya û rastiya gelên Sûriyê di nav re jî gelê Kurd derdixiste pêş, ev yek jî piştî zexta mezin a ji hêla gelên Sûriyê û dezgehên ragihandinê yên xwecihî. Ev dezgehên dibêjin li ku derê bûyer hebe em li wir in û dibin dengê veguhestina rastiyê. Lê ev yek berovajî û nerast derket, xebata ku li ser rûyê erdê dûrî siloganên van kenalan eşkere bû, eşkere bû ku ew li gorî berjewendiyên taybet yên hin aliyan tevdigerin. Di serdema rêjîmê de ew dijberên wê rêjîmê bûn, di serdema hikumeta HTŞ’ê de va ye, hevalbendên wê ne, mirov dibêje belkî kenalên taybet bi HTŞ’ê ve girêdayî ne. Ev yek tekez bû dema ku êriş li ser Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û paşê Rojavayê Kurdistanê çêbûn. Di vî şerê berdewam de, van her sê dezgehên çapemeniyê li şûna ku kiryarên HTŞ û komên çete yên girêdayî dewleta Tirk, herwiha binpêkirina agirbestê ya ku bi destê çeteyan ji raya giştî re ragihînin, lê belê çavên xwe jê digirtin, di heman demê de serkeftinên HTŞ’ê didan pêş. Berê kamîreyên Cezîrê, Hedes û Elerebiye li serkeftinên HTŞ’ê yên li ser hisabên xwîna gelê Kurd bûn, ne li ser penaberan bûn, ne li ser komkujiyan bûn, ne li ser heqîqetê bûn. Ji ber vê siyaseta ku her sê kenalan li ser dimeşin, Mixmediya ya Başûrê Kurdistanê rê li ber weşana rojnamegeriyê ya van kenalan û hin kenal û ajansên din ên ku piştgiriya hikumeta HTŞ’ê dikin, girt. Di heman demê de kampanya Arast jî weşana van kenalan qedexe kir. Herwiha Yekîtiya Ragihandina Azad jî bi daxwiyaniyeke nivîskî yekalîbûna van kenalan a dûrî rastiyê, da, ev yek weke hişiyariyekê bû ji xebata wan a rojnamegerî ya dûrî wijdan û perensîbên çapemeniyê. Lê ya herî guncav ew ku aliyên têkildar û pispor ên herêmî û navneteweyî, saziyên maf û yasayî bi berpirsiyariya xwe rabin û van kanalan ên sûcên tûjkirin û xîtaba nefertê belge bikin. Divê komîteyeke serbixwe ji Rojnamevanên Sînornenas were avakirin û ev komîte xebata rojnamegiya van her sê kenalan bişopîne û encama xebata wan ji dezgehên çapemenî, mafên mirovan û civaka navdewletî ve bi par ve bike.



# ‘Jiyana li dibistanan zehmet e û pêwîstiya me bi alîkariyê heye’

Koçberên Efrînê ku sê car in koçbder dibin û niha li dibistanên bajarê Qamişlo bi cih bûne diyar kirin ew gelek zehmetiyan di jiyana li dibistanan dibînin û pêwîstiya wan gelek pêdiviyên jiyanî heye.

**Aryen Hesen/Qamişlo**

Piştî berxwedaniya 58 rojan ya gelê Efrînê ku bi berxwedaniya Serdemê hate binavkirin, di 18’ê Adara 2018’an de Efrîn bi planeke navnetewî ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî hate dagirkirin. Gel bi dare zorê koçber bûn û berê xwe dan herêma Şehabyê û li wir 7 salan jiyana xwe bi hêviya vegerê derbas kirin, lê ji ber êrişên çeteyên dewleta Tirk û dorpêçê dîsa di 1’ê kanûna 2024’an de careke din koçberî bû para gelê Efrînê û vê carê berê xwe dan Tebqa û Reqayê.

Di 6’ê çile hikumeta demikî êrişên hovan e li ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê da destpêkirin. Çeteyan bi awayekî dijwar êrişî sivîlan dikirin, lê sekina berxwedaniyê û dîlana azadiyê ji dijmin re dibû bersiv. Gel û şervana bi giyanekî fedayî parastina taxên xwe yên Kurdî dikirin. Çeteyan bi alîkariya dewlewta Tirk a dagirker êriş pêk tanîn û çekên pêşketî bikar dianîn. Êriş dijwar bû, birîndar û Şehîd zêde bûn ji ber vê yekê bi lihevkirinekê di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê û hikumeta demkî de, gel û şervan ji herdû taxan derketin û berê xwe dan herêmên Rêveberiya Xweser li Tebqa û Reqayê.



**Reşîd Mihemed**



**Fatma Ismaîl**

Di 17’ê Çile de êrişeke hovane ji aliyê hikumeta demkî ve bi ser Tebqa û Reqa de hat kirin, ji ber êrişên dijwar çareke din gelê Efrînê neçar ma ku koçberî herêma Cizîrê bibin. Niha jî koçberên Efrînê ku berê xwe dane kantona Cizîrê di dibistan û mizgeftan de bi cih bûne. Rewşa wan a jiyanî gelek zehmete û gelek pêdiviyên jiyanî ji gel re pêwîstin.

Di vê çarçoveyê de koçberên Efrînê Reşîd mihemed û Fatma Ismaîl ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Xwedî li koçberan derbikevin’**

Koçberê Efrînê yê bi navê Reşîd Mihemed behsa serpêhatiyên koçberiyê kir û wiha anî ziman: “Piştî em ji Efrînê bi dare zorê koçber bûn me berê xwe da Şehbayê û jiyana xwe li wê derê berdewam kir, lê mixabin careke din ji ber êrişên çeteyên dewleta Tirk li ser Şehbayê dîsa em koçber bûn û me berê xwe da Reqayê, ev saleke em li Reqayê dîmînin tevî hemû zor û zehmetiyan me jiyana xwe berdewam dikir. Lê careke din ji ber êrişên hovan e yên hikumeta demkî li ser Reqayê em koçber bûn û me berê xwe herêmên Cizîrê û di dibistana Şerîf Alredî a li bajarê Qamişlo bi cih bûn.

Me gelek zor û zehmetî dîtin heya ku em gihaştin vê derê. Em niha di dibistanan de bi cih bûne û ji ber rewşa sermayê û zivistnê jiyana li dibistana zehmete, derfet û pêdiviyên me kêm in. Zarokeke min astengdar heye, tenduristiya wî ne ewqas başe pêdivî û dermanên taybet jê re pêwîstin. Di vê milî de em gelek zehmetî û astengiyan dibînin, ji bo vê yekê jî banga me ji hemû rêxistinên mirovî re ku xwedî li koçberan derbikevin û bi me re alîkar bin.”

**‘Hemû pêdiviyên jiyanê ji me re pêwîstin’**

Koçbera bi navê Fatma Ismaîl jî behsa rêwîtiya xwe di nava koçberiyê de kir û wiha got: “Em koçberin ji bajarê Efrînê ne, ji ber êrişên dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî em bi dare zorê ji warê xwe koçber bûn û me berê xwe da herêma Şehba. Me 7 sal ji jiyana xwe li Şehbayê bi hêviya vegera Efrînê derbas kir û her roj em li benda mizgîniya vegera Efrînê bûn. Careke din dewleta Tirk û çeteyên wê êrişî me kirin û em ji Şehbayê jî koçber kirin. Me gelek êş û zehmetî dît, piştî ku em ji Şehba koçber bûn me berê xwe da Reqa û lê wê derê em di dibistanan de bi cih bûn. Jiyana li dibistana gelek zehmete û bi taybet ji kesên bi temen mezin re.

Niha jî em dîsa ji Reqa koçber bûn me berê xwe da Qamişlo em di dibistana de jiyan dikin, pêwistiya me bi gelek tiştan heye. Ez jinek bi temen mezin im, gelek nexweşî bi min re hene. Ji bo vê jî cûreyên derman ji min re pêwîstin û xizmetî jî pêwîste lê derfetên me kêm in. Ez bang li hemû kesan dikin ku li kêleka koçberan biseknin.”

# ‘Ji ber rewşê em niha nikarin werzê duyemîn dest pê bikin’

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya kantona Cizîrê Gulîstan Ismayîl diyar kir ku pêwîst bû niha werzê duyemîn yê perwerdeyê li dibistanan hatiba destpêkirin û got, “Ji ber êriş û koçberiya heyî em nikarin niha werzên duyemîn yê perwerdeyê dest pê bikin.”**

Pêwîst bû ku niha li dibistanên kantona Cizîrê werzê duyemîn yê perwerdeyê hatiba destpêkirin, lê ji ber êrişên li ser gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê û bicibûna koçberan di dibistanan de, perwerde hatiye rawestandin.

Di derbarê mijarê de Hevseroka Desteya Perwerde û ya kantona Cizîrê Gulîstan Ismayîl ji Rojnameya me re axivî.

**‘Gerek niha werzê duyemîn yên dibistanan hatiba destpêkirin’**

Gulîstan diyar kir ku gerek werzê duyemîn yên dibistanan hatiba destpêkirin lê ji ber rewşan nehat destpêkirin û wiha got: “ Li gor biriyara werzê duyemîn yê xwendinê gerek xwendekar, mamoste û herwiha xebatkarên girêdayî dibistanan derbasî dibistanan bûbane. Lê ji ber şer û êriş çêdibin ev dibe asteng li pêşiya nevekirina dibistanan. Ji xwe xelkên me yên Şêxmeqsûd, Eşrefiyê, Tebiqa û Reqa ji ber êrişên çeteyan berê xwe dan kantona Cizîrê. Ji ber vê Desteya Perwerdeyê hemû dibistanên xwe yên li kantona Cizîrê ji Dêrikê heya Hesekê kirin penageh ji bo xelkên me yên Koçber da ku cihê xwe di dibistanan de bigirin. Herwiha me ev koçber xistin dibistanan ji ber ku tû cihên din tunebûn ku tê de bicih bibin lê em mecbûr bûn ku em wan derbasî dibistanan bikin.”

**‘Ji ber bicihbûna koçberan di dibistanan de bû sedemek ji bo destpêkirina werzê duyemîn’**

Gulîstan Ismayîl anî ziman ku ji ber bicihbûna koçberan di dibistanan de bû sedemek ku ew nikarin dest bi werzê duyemîn yên dibistanan bikin û wiha berdewam kir: “Ji ber van êriş û koçberiyên ku çêdibin ev bû sedemek ku em nikarin perwerdeyên dibistanan dest pê bikin. Di heman demê de jî niha li tevahî dibistanên bajaran koçber tê de bicihbûyî ne ev jî sedemeke ji bo destpêkirina dibistanê. Lê belê pêwistiya nevekirina dibistanan hem ji bo parastina zarokan û hem jî ji ber seferberiya ku ji aliyê Rêveberiya Xweser û Insiyatîfa Gel ve ji bo parastina civakê hat destpêkirin û herwiha jî ji bo bicihbûna koçberan di dibistanan de ev hemû bûn asteng ji bo destpêkirina werzê duyemîn.”

**‘Êriş rê nedan ku xwendekar perwerdeya xwe bibînin’**

Gulîstan di berdewamiya axaftina xwe de bal kişan li ser perwerdeya dibistanan û wiha got: “Gerek niha xwendekar berê xwe dabane dibistanan lê belê ev êriş rê nedan ku ev xwendekar perwerdeya xwe bibînin û herwiha rê nedan ku ev zarok bi rihetî pirtûkên xwe rake û berê xwe bidine dibistanan. Em hemû dizanin ku dibistan cihê perwerdeyê ye, ku her zarokek berê xwe bidiyê de û bi pîskilojiyeke rihet perwerdeyan bibînin. Lê niha em dibînin ku gelek zarok dinava koçberiyê de ne û di rewşeke zehmet de jiyan dikin ev jî bandoreke gelekî mezine ku zirarê dighêje jiyana zarokan. Herwiha li kobanê jî gelek zarokên me di nav dorpêçeke zehmet de jiyan dikin ev jî şermeke mezine ji bo giştî mirovahiyê. Di heman demê de ev êrişên psîkolojîk, fîzîkî û herwiha yên civakî bi tayîbet yên li ser zarokan tê kirin. Gerek herkes bi van êrişên li ser zarokan bêdeng nemîne û rê le ber van êrişan bigirin.”



**‘Zarok dinava metisiyekê de jiyan dikin’**

Hevseroka Desteya Perwerdeyê ya kantona Cizîrê Gulîstan Ismayîl da xuyakirin ku zarok dinava metisiyekê de jiyan dikin û wiha bidawî kir: “Em dibînin ku îro zarok di nava meterisiyeke mezin û xeteriyeke mezin de jiyan dike divabê ku zarok bi zarokatiya xwe û bi hişê zaroktiyê jiyan bike lê ev êriş rê nadin ku zarokek bi rengekî xwezayî jiyan bike. Em hemû berpirsên qadên perwerdeyê, ji bo jiyana van zarokan em wek sûcekî mezin yê şer dibînin û herwiha jî em li dijî pîvanên mirovî û pîvanên qanûnî yên mafê zarokan dibînin. Ji bo van êrişên li ser zarokan bengewaziya me ji hemû destgeh, sazî û herwiha çi rêxistinên ku li ser mafê mirovan û mafên zarokan kar dikin gerek ev hemû rêxistin bêdeng nemînin, helwestên xwe diyar bikin û rê li ber van êriş û komkujiyan bigirin.”



## Tofana Nûh dest pê kir

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Di hemû pirtukên pîroz de behsa tofana Hz Nûh tê kirin. Tewrat, Încîl û Zebûr dibêjin keştiya Nûh li ser çiyayê Agirî daketiye, lê Qur’ana pîroz dibêje ew li ser çiyayê Cudî sekiniye.

Hemu behsa piroziya xaka Kurdîstanê û bingeha mirovahiyê li ser vê axê dikin.

Dema mirovahî qirêj bûye, di guneh û nebaşiyan de fetisîye, tofan rabûye û li gor hemû pirtûkên pîroz di tofanê de gunehkar û kesên jirêderketî tunne bûne. Dinya carekî din li ser xweşî, rindî û dadweriyê hatiye avakirin.

Ev zêdetirî sed salî ye li ser xaka pîroz û gelê me zilm û zordariyek pêk tê. Ev zilm û hovitî her diçe girantir û zêdetir dibe. Gelê me tê qirkirin, mal û hebûna wî tê desteserkirin, destdirêjiya namûs û şerefa wî tê kirin. Rexmî wê jî, Kurd dibêjin werin em li gor ola Îslamê pirsgirêkên xwe çareser bikin, ew dibêjin na, Îslama me û ya we cûda ye. Raste em ji Îslama Xwedayê dilovan bawer dikin û bi merhemet tevdigerin.

Me got temam em biran e, me xaka xwe, nanê xwe mala xwe bi wan re parve kir û biratiyekî durustî meşand. Ji ber çanda me ya bihevre jiyanê çandekî qedîm û kevne. Îslama me de exlaq û hevkariya başîyê heye, ya wan de pere û desthelat heye. Di ola wan de kuştin, talan û zilm heye. Ma ne ew bûn nevîyê Pêxember li kerbelayê bi tevê dergûşên wî dorpêç kirin, bê nan û bê av hîştin û piştre kuştin. Serê wan jêkirin bajar bi bajar gerandin. Hişmendiya vanan zilm û zor e, li ba wan tu qedrê ol, raman û mezheban nîne. Ji ber wê ji Mizgeftên xwe bi navê ol suretul Enfal û surta Fethê dixwînin. Fetwa kuştina me didin, malê me û namaûsa me li xwe helal dikin. Dewleta Tirk û ev çêteyên hanê xwedan heman hişmendiyê ne. Elewî kuştin, Durzî kuştin, neha dora Kurdan e. Kuştin, zilm, talan û guneh li vê erdnîgariyê bicîh kirin. Kurdan xwestin vê erdnîgariyê paqij bikin, biratî û dadmendiyê bicîh bikin, mixabin bi îxaneta, Emerîka, Rûsya, Awrupa û fîtnekarîya Tirkan û hevkariya Qeter û Suudî felaket li ser serê me çêkirin.

Tiştê li serê gele me anîn, li serê Hz Nûh nehatiye.

Ji Nuhre weha gotin. ”Ger tu rastgoyî ka bêje bira tofan rabe”. (Hud 32)

Tofanê dest pê kir avê ji erd û asîmanê xwe berda. Nûh siwarê keştiyê bû kesên xwedan raman û baweriya paqij pere xilas bûn.

Keştî bi rojan li ser avê sekinî, heta erd ji xirab û gunehkaran paqij bû.

Neha tofana Kurdan rabûye, dewleta Tirk û hevalbendên wê xirabî û wehşeta li welatê me pêk tînin, dibin sedem ku tofan rabe. Kurd weke tofanê li hemû cîhanê pêl didin, gunehkar û qatilan ditirsînin, ev pêl her wê li Kurdîstanê bidin û dê Kurdistanê ji guneh û zilmê paqij bikin. Mirov dibîne ji erd û asîmanan Kurd dibarin. Ger ev Baran bê navberber berdewam be, dê derguşa mirovahî Kurdîstanê, ji dagirkeriyê paqij bike. Jibo başî, edalet, wekhevî û baweriyên rast werin jînkirin, pêdivî bi tofana heye. Mirovahî gellekî xirab buye. Keştiya hz Nuh wê carekî din li Kurdîstanê dakeve û wê mirovahî ji xirabiyan were şuştin.